



TÊKOŞER



HEJMAR 39

ADAR 1988



TÊKOŞER: KOVARA TÊKOŞER, YEKÎTIYA KARKER Û XWENDEKARÊN KURD LI BELÇIKA

NAVNIŞAN: rue BONNEELS, 4 - 1030 BRUXELLES - BELGIQUE

TEL: 02/230.89.30

NAVNIŞANA POSTÊ: B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE

BUHA: 50 F.B.

N° BANKE: 426-3144071-85 - K.B. - BELGIQUE

BERPIRSIYAR: M. Nezh YALÇIN

KOMÎTA NIVÎSKARIYÊ: Derwêş, Nezîh, Pervîn

| | | |
|--|-----------------------------|----|
| HÎROŞTMA = HALABCA | Pervîn | 3 |
| KURDISTANA IRAQÊ : Nijadkujî li Kurdistanê | Pervîn | 4 |
| Çekên şîmîk li Kurdistanê Iraqê | Temel DEMIRER .. | 6 |
| KURDISTANA ÎRANÊ : Bang ji cihanê re | | 9 |
| KURDISTANA TIRKIYÊ : Zindana Diyarbêkrê | Derwêş | 11 |
| Rappora Amerîkî li ser Kurdên Tirkîyê | | 12 |
| KURTEÇÎROK : Rêwîyê mirî | Ş. B. SOREKLÎ | 13 |
| ÇÎROK : Hêk | A. NEQŞEBENDÎ | 14 |
| WÊNE | H. KAPLAN | 17 |
| DÎROKA KURDISTANÊ DI ANSÛKLOPÊDIYA ISLAMÊ DE (XII), Civaka kurdî (3) | | 18 |
| WÊNE | H. KAPLAN | 22 |
| NEWROZ, 21'ê ADARÊ yan 31'ê TEBAXÊ ? | Pervîn | 23 |
| HELBEST : Em, Ş. B. SOREKLÎ; Nîroz, Bîndest | | 24 |
| RÊZIMANA KURDÎ (XII), Nîşank li ser parekan | C. BEDIR XAN û R. L. ... | 25 |
| WÊNE | H. KAPLAN | 31 |
| XEBATA ME | | 32 |
| TÊKOŞER'DEN HABERLER | | 34 |
| <hr/> | | |
| HIROCHIMA = HALABDJA | Pervîn | 3 |
| KURDISTAN D'IRAK : Génocide au Kurdistan | Pervîn | 4 |
| Armes chimiques au Kurdistan d'Irak | Temel DEMIRER .. | 6 |
| KURDISTAN D'IRAN : Appel au monde | | 9 |
| KURDISTAN DE TURQUIE : Prison de Diyarbêkir | Derwêş | 11 |
| Rapport américain sur les Kurdes de Turquie | | 12 |
| CONTE : Le voyageur mort | Ş. B. SOREKLÎ | 13 |
| NOUVELLE : Les oeufs | A. NEQŞEBENDÎ | 14 |
| DESSIN | H. KAPLAN | 17 |
| HISTOIRE DU KURDISTAN DANS L'ENCYCLOPÉDIE DE L'ISLAM (XII), La société (3) | | 18 |
| DESSIN | H. KAPLAN | 22 |
| NEWROZ, 21 mars ou 31 août ? | Pervîn | 23 |
| POEMES : Nous, Ş. B. SOREKLÎ; Nîroz, Bîndest | | 24 |
| GRAMMAIRE KURDE (XII), Remarques sur les particules ... | C. B. KH. et R. L. ... | 25 |
| DESSIN | H. KAPLAN | 31 |
| NOS ACTIVITES TRIMESTRIELLES | | 32 |
| <hr/> | | |
| HIROCHIMA = HALABDJA | Pervîn | 3 |
| IRAACS KOERDISTAN : Génocide in Koerdistan | Pervîn | 4 |
| Chemische wapens in Iraacs Koerdistan .. | Temel DEMIRER .. | 6 |
| IRAANS KOERDISTAN : Oproep tot de wereld | | 9 |
| TURKS KOERDISTAN : De gevangenis van Diyarbêkir | Derwêş | 11 |
| Amerikaans rapport over de Koerden in Turkijê | | 12 |
| KORT VERHAAL : De dode reiziger..... | Ş. B. SOREKLÎ | 13 |
| VERHAAL : De eieren | A. NEQŞEBENDÎ | 14 |
| TEKENING | H. KAPLAN | 17 |
| GESCHIEDENIS VAN KOERDISTAN IN DE ENCYCLOPÉDIE VAN DE ISLAM (XII), De Koerdische samenleving (3) .. | | 18 |
| TEKENING | H. KAPLAN | 22 |
| NEWROZ, 21 maart of 31 augustus ? | Pervîn | 23 |
| GEDICHTEN : Wij, Ş. B. SOREKLÎ; Nîroz, Bîndest | | 24 |
| KOERDISCHE SPRAAKKUNST (XII), Bemerkingen bij de voor- en achter-voegsels | | 25 |
| | C. BEDIR XAN en R. LESCOT.. | 25 |
| TEKENING | H. KAPLAN | 31 |
| ONZE TRIMESTRIELE ACTIVITEITEN | | 32 |

HÎROŞÎMA = HALABCA

Pervîn

Di 18.3.1988 de, balefirên Iraqê bombeyên şîmîk avêtin ser bajarê HALABCA, li Kurdistanê Iraqê, ku tê de 70.000 rûniştevan hebûn. Van bombeyan di rojekê de 5.000 kes kuştin û bi hezaran birîndar kirin. Li gora bijîjkan (doktor), ewê sêçarîkê van birîndaran jî bimirin ! Kesên mayîn ji vî bajarê bijar reviyen. Îro Halabca navçeyê têkdayî (xerakinî) û mirî ye. Ew bûye sembola nijadkujiya (qetliam) kurdî ya nûjen. Piştî wê bi çend rojan, cardin hikûmeta Iraqê çekên şîmîk avêtin çend gundên vê navçeyê û Kurdistanê Îranê jî !

Ev nijadkujî di hemî weşanên cihanê de hat nîşan dan. Rêxistinên navnetewî û piraniya hikûmetên ewropî ew mahkûm kir. Lê herkes dizane ku maddeyên şîmîk ên van bombeyan ji welatên cihê yên ewropî ji hikûmeta Iraqê ya faşîst û ji yên weka wê re tên şandin. Û herkes dizane ku Iraq Protokola qedexekirina bikaranîna çekên şîmîk ku di 1925 de ji aliyê 108 welatan, ku di nav wan de endamên îroyîn yên NATO û Lihevhatina Varsofî hene, hat peji-randin (qebûl kirin) imza kiriye ! Iraq nuha jî, bi dengekî bilind û bê şerm îlan dike ku ewê cardin van çekan bi kar bîne ! Ango, em li hêviya gelek tiştên din ên trajîk bimînin, nemaze ku Serokwezîrê Tirkîyê, Turgut Ozal, di vê heftê de çû serdana (ziyaret) Bexdayê ! Ji bo gelê me ku hînî berengariyê (xweparaztin) dijî hemî awayên êşandin û kuştinê bûye, dibe ku ev felaketa mezin ku amanca wê bicarek imhakerina wî ye destpêka awayê nuh a nijadkujîyê be.

Li herderê Ewropa û welatên din, Kurdan xwepêşandanan (meşîn) li ber sefaretxanên Iraqê pêk anî û hovîtiya kirêt a hikûmeta Iraqê bi xurtî protesto kir.

XEBAT LI BELJÎKA

Li Beljîka, Kurdên ku ji her çar

perçeyên Kurdistanê hatine di 30.3. de vê nijadkujîyê, bi navê Kurdên Beljîka, protesto kir. Ji derveyî Kurdan, nûnerên hema tevayiya Partiyên Beljîkî, hin endamên Parlamana Ewropa, nûnerên rêxistinên Beljîkî yên mezin û yên rêxistinên Iraqî, Marokî, Îranî û Tirkî jî hati bûn ber deriyê sefaretxanê, ji bo piştgiriya me. Parlamenterê Ewropî Jef Ulburghs axaftineke hêja li ser pêwistiya bilez a dayîna mafên gelê kurd li her çar perçeyên Kurdistanê çêkir. Her du televîzyonên beljîkî, radyo û piraniya rojnaman vê xwepêşandana giring weşand.

Berê vê xebatê, di 23.3. de, Kurdên Beljîka, bi piştgiriya çend rêxistinên beljîkî yên giring, daxuyaniyê çapê weşand. Û di 25.3. de, serokê Komîta Pêwendiya Rêxistinên Serbixwe yên Civakên Ewropî, Pierre Galand, bi navê vê Komîtê, ji sefirê Iraqê li Brukselê re nameke protestokirinê şand û jê xwest ku wê ji hikûmeta Iraqê re bide nasîn. Di vê namê de, P. Galand mafên Kurdan li her çar perçên Kurdistanê jî xwestin.

Rêxistina serbixwe ya bijîjkên beljîkî Médecins Sans Frontière-Belgique û alîkarê mutexassisê navnetewî yê çekên şîmîk, Dr Heyndricks, tevil çûn Halab-cayê ji bo ku ankêteke tîbbî çêkin û çend birîndaran li nexweşxanên beljîkî razênin. Piştî ankêtê, vê rêxistinê hesabeke bankê ya taybetî, N° 000-0000060-60, ji bo alîkariya tîbbî vekir û kampanyeyeke mezin ji bo birîndarên Kurdistanê çêkir. Hikûmeta Beljîka jî, ji bo vê amancê, 5 milyon frengên beljîkî diyarî kirin vê rêxistinê.

Ji bo ku ev nijadkujî qet neyê ji bîr kirin, hemî Kurd divên ku xebateke dûr û dirêj, li her derê Ewropa, çêkin. Bîranîna wê divê ku bi awayên cihê bê kolan.

NIJADKUJÎ LI KURDISTANÊ

Pervîn

Pêsgotin : Min vê gotarê ji bo rojnama beljîkî *Le Drapeau Rouge* nivîsî û ew di 29.3.88 de hat weşandin. ez li vê derê metnê wê ji fransîzî wêrdigerînim kurdî :

Avêtina çekên şîmîk li ser Kurdistanê Iraqê Kurdên ku heta nuha ji aliyê gengaziyên (wasite) weşanê ne dihatin hez kirin ji nişka ve ji siyê dehf da pêşiya alana navnetewî. Kirêtiya çew-sandinê (qirkirin) nuha bûye babeta sereke ya hemî weşanan.

Mixabin, bûyereke ewqas trajîk diviya bû ji bo ku îcar li ser Kurdan, ev gelê ku êşan ji sedsalan dixê ser hev, bê peyivîn. Lê, li gel ku bédengî hat şikestin, gengaziyên weşanê li vê pirsê ewqas zor hûr nanêrin û têkoşîna Kurdan dijî hikûmeta Bexdayê û şerrê Iraq û Îranê tev li hev dikin. Ew Halabca, ku tê de ev çew-sandin hat kirin, di çarçeva şerrê bajarê de dibînin. Ev yek xelk şaş dixe û dihêle ku ji xwe pirsên ecêb bipirse : Çima Iraq "bajarê xwe" û "gelheya xwe", dêlva yê Îranê, diçewisîne ?

Em berê bûyeran ji hevdu veqetînin: Ji 1961, Kurdên Iraqê têkoşîneke çekdarî dijî rejîma Bexdayê dikin, ji bo ku mafên xwe bistînin û rejîma faşîst a Iraqê dêmokratîk bikin. Ji du salan, wan eniyeke bi navê CUD (Eniya Niştîmanî ya Dêmokratîk) bi Partiya Komunîst a Iraqê re pêk anîne (*). Li aliyê din ê sînorê, Kurdên Îranê jî dijî rejîma Xumeynî şerr dikin. Ango, têkoşîna Kurdan li her du aliyan ji şerrê Iraq û Îranê, ku Iraq di 1979 de dest pê kir, gelek kevntir e.

Ji bo Kurd, li her du aliyan, ji aliyê hikûmetên xwe bicarek hatine pelixandin : Bombbaranên rojî yê bajar û gundan, dorgirtina aborî, qedexekirina ketina Kurdistanê ji aliyê



rojnamevan û komîsyonên ankêtan.... ew neçar (mecbûr) dibin ku alîkariya hikûmeta dijmin bipejirînin. Ev hevkarî dibe ku ne tebîî be, lê ew bitenê taktîk e. Li alana navnetewî jî Kurd tenha ne, ji bo ku zewiyê (erd) wan gelek stratêjîk û dewlemend e : Ew di navbera Kendawê (Xelîc) Farisî, Yekîtiya Sovyêtî û Deryayê Sipî de ye û bi petrol û madenên cihê dewlemend e. Tu hikûmet di menfeeta wê de tu neye ku piştê Kurdan bigire, ji tîrsa ku çar dewletên bihêztirîn ên Rojhilata Nêzîk : Tîrkiye (endama NATO, Konseya Ewropa... û xwazgîna Bazara Ewropî), Îran, Iraq û Sûriyê "bixeyidîne". Jixwe ev dabeşkirin di çar perçan de, ji aliyê Hev-

(*) Eniyeke din jî di nav Partiyên Kurdên Iraqê de, Eniya Kurdistanî, heye.

karên Ingilîz û Fransîz piştî Şerrê Cihanê yê Yekemîn, ne tesadufek e.

Dema ku şerrê Iraq û Îranê dest pê kir, leşkerê iraqî hêzên xwe li eniya Başûr civandin. Kurd, ku li Bakur in, li cihê ku tê de bîrên petrolê hene, alîkarî ji leşkerê îranî ku amanca wî vekirina eniyêke duyemîn li Iraqê, nemaze di movika piştî wê, Kurdistan, de, ye stend. Iraq, ji harbûnê, di rojekê de bi çekên şîmîk 5.000 Kurd çewisandin û bi hezaran birîndar kirin....

Bûyereke din a gîning : Ev ne cara yekemîn e ku Iraq bombeyên şîmîk davêje ser Kurdan. Wê ew dijî wan hîn di 1975 de, ango gelek berê ku wan bavêje ser Îranê, bi kar anî bûn.


Li her sê perçeyên din ên Kurdistanê Kurnd ne kêmîr hatine pelixandin. Linavbirina (imha) wan a fîzîkî û têkdana hêdî û rêkûpêk (muntazam) a çanda wan NIJADKUJIYEKE rast a CANÎ Û ÇANDÎ ye. Tîrkiye heta hebûna Kurdan bixwe jî inkar dike û navê wan bi awakî fermî (resmî) dike "Tirkên çiyayî" yan "Tirkên Rojhilatê". Ew Ata Turk, avakerê Tîrkiya "nûjen", bû ku nijadparêziyê li Tîrkiyê fermî kir. Wî bi zagoneke (qanûn) ku di

1924 de derket dibistan, rêxistin û weşanên kurdî qedexe kirin. Heta îro, tu partiyeke ku di destelatê (îktidar) de ye rakirina vê zagonê ne xwestiye.

Li Ewropa jî, ku tê de ji 500.000 bêtir Kurd dijîn, ev her çar hikûmet, nemaze ya Tîrkiyê, peyên (tezyîq) mezin li hikûmetên ewropî dikin ku rêxistinên kurdî, ku pirîncar çandî ne, nîkaribin xebata xwe bikin.

Cara yekane ku li alana navnetewî li ser çarenûsa Kurdan biryar hat stendin di 1920 de, li Peymana Sêvr ku ji aliyê Civaka Netewan hati bû imza kirin, bû. Li gora vê peymana ku xwe disipart 14 Xalên serokê amerîkî Wîlson û "mafê netewan ê çarenûsê", beşeke mezin ji Kurdistanê ewê serxwebûna xwe, weka gelên din ên hawsê (cîran) bisten da. Lê, piştî du salan, di 1922 de, Peymana Lozan a Sêvr têk da, ji sedema dijîtiya Ata Turk û Ingilîzên ku dest danî bûn ser petrola Kurdistanê Iraqê.

Ev parvekirin di nav çar perçan de û lîzên mezin ên navnetewî, yê stratêjîk û aborî, ne ku nahêlin ku tevgera kurdî yek bibe. Li gel vê qasê, em bihêvî dimînin, ji bo ku em pêşveçûneke hêdî, lê rast, dibînin.



ÇEKÊN ŞÎMÎK LI KURDISTANA IRAQÊ

Temel DEMIRER

Pêşgotina Têkoşer

Berê çend mehan, rojnamevanê tirk ê serbixwe Temel DEMIRER çû bû Kurdistanê Iraqê, ji bo ku bi çavê xwe têkdana (xerakirin) bombeyên şîmîk ku hikûmeta hov a Baas davêje ser Kurdistanê Ewropayîyan agahdar bike. Nivîsarên wî di rojnameyên cihê de hatin weşandin û wî ji me re jî gotarekê bi zimanê fransîzî şand. Em li jêr wê werdigêrînin kurdî :

Gotûbêj li ser "qedexekirina" çekên şîmîk" yek ji pirsên bingehî yên ku hêza berengariya (xewparaztin) netewî ya Kurdistanê, li Bakurê Iraqê, bi wan xerîk (mijûl) dibe ye. Di dirêjayiya gerra min di vê navçeyê de, li ser vê yekê pirs ji min hatin pirsîn, û ez baş têgihajtim giringiya gotûbêjên ku li O.N.U. (Rêxistina Netewên Yekbûyî) li ser wê dibin, ji bo ku ez dikarim dêlva rûniştevanan bibim şahidê bombeyên şîmîk.

Bombabaranên pêşîn li cîgehên berengariya netewî ya kurdî di Nîsan 1987 de dest pê kir :

15.4.87 : Hildin, Barclo, Kanitu, Zeni, Bellokawa, Hate Alane, Şeyx Wassan, Diraci.

17.4.87 : Kiywa, Maut, Pera, Macrum.

21.4.87 : Karadag.

24.4.87 : Vadi û Belisan. Nemaze ev her gund bicarek bi bombeyên şîmîk hatin têk dan.

Di navbera 60 û 70 bombe li van deran hatin avêtin. Çewsandineke (qirkirin, kuştina gelek kesan bicarekê) rast çêbû : 128 kes li Şeyx Wassan, 120 li Belîsan, 42 li Melekan, 20 li Amedyat. Di vê salê de, di navbera 15 û 24 Nîsan de 77 êrîşên hewayî hatin kirin.

Heta îro, êrîşên hewayî dewam dikin, ji bo vemirandina tevgera berengariya netewî ya kurdî ku heta ji maskên gazê bêpar (mehrûm) e, li hemberî bombeyên şîmîk ku li Akasa (li Iraqê) bi maddeyên ku ji Almanya Federal û Hollanda tên şandin tên çêkirin (li gora rojname Der Spiegel).

Kurdisk offe


Av LARS BOSTRÖM

Den kurdiska Pesh Merga-gerillan i norra Irak är åter på offensiven. Efter att de tidigare så splittrade gerillagrupperna i augusti i år enades i en nationell front har deras styrka ökat avsevärt.

Den bedömningen gör den turkiske frilansjournalisten Kirve Kalender, som i drygt tre månader vistats i de gerillakontrollerade områdena på uppdrag av nyhetsbyrån Kurdistan Press i Stockholm.

— Gerillan är stark, välbeväpnad och välorganiserad, säger han. I bergen har kurderna total kontroll medan regeringstrupperna håller de större städerna och vägarna på slättlandet.

Under de senaste månaderna har gerillan, enligt egna uppgif-



• Den turkiske frilansjournalisten Kirve Kalender har nyligen vandrat med gerillan i norra Irak.

Heta maddeyên ku ji bo çêkirina van bomban bi kar tên jî tên zanîn : Hardêle-mitrogène-illuzat-alzarine-tabun-zuman-arcine-hydrogène seiyanik syonogichloride-carbone oxide-fossine day-fossine tray. Hemî ev zanîn ji aliyê kolonel Abdulselam ABDULLAH (40 salî), girtiyekî rêzanî (siyasî) li HATE, ji min re hatin dayîn.

Dema ku ez li navçeyên rizgarkirî bûm, ez bûm şahidê gelek bombabaranan û ez dikarim bêjim ku rewşa ku min dît bi rastî jî trajîk e. Netewek bixwe tê çewsandin, imha kirin. Metnê fermaneke ku ji aliyê "Serokatîya Navçeya Bakurê Iraqê" ku di bin idareta leşkerî, li Kurdistanê, de ye hatiye weşandin vê yekê îbat dike :

1- Gundên ku tê de sabotajker, xayinên welêt û yên ku pişt wan digirin hene divê ku weka tehdîd ji bo emniyeta netewî bên hesab kirin.

2- Ango, ev gund weka gundên ku divên bên imha kirin tên hesab kirin; lawir (heywan) û rûniştevanên vê navçeyê divê ku bên têk dan. Ev talîmat heta fermaneke nuh tê tatbîq kirin.

3- Xebata pîşesazî (sinaet) û ziraetê, derketin û ketina hundir bicarek qedexe ne. Hemî organên fermî (resmî) divên ku van talîmatan tatbîq bikin.

4- Hemî berpîrsiyarên leşkerî divên bi awakî daîmî êrîşî van navçeyên bitehlike bikin; ev êrîş divên şev û roj dewam bikin.

- 5- Rûniştevanên van navçeyan divên ku ji aliyê hêzên emnîyetê bîn pirs kirin, û piştî ku ew malûmatan didin divên bîn dar ve kirin !!!
- 6- Pirs nikarin ji sê rojan bêtir dewam bikin, 10 roj di hin rewşên taybetî (xusûsî) de.
- 7- "Firqeyên niştimanperwer ên herbiyetê" dikarin tiştên ku dikevin destê wan "xênîme", ji xeynî çekên taktîk, ji xwe re bistînin.

Serokên firqeyên niştimanperwer ên herbiyetê divên ku hesaba encamên (netîce) êrîşên xwe bidin hikûmetê. Bicihanîna hemî van talîmatan gelek pêwîst e.

DAWÎ

Ez gelek dixwazim ku modêlên bombe-yên ku li ser van navçeyan hatin bi kar anîn bidim nasîn; hin ji wan ne teqiyar û hatin avêtin. Li gora ku min karî bû navên wan bixwînim, min lîsteke wan, tevî navên cihên ku ew lê de hatin dîtin, çêkir :

Li **TOTME** : HE TNT/SHELL DC-W 1620/lot 140/81/120 MM "MORTAR" (In-giltire).

S-IN, M-28 E2/6-53/TC.
120 F = (AMERÎKA)
AM 9 84 TC 2 (FRANSA)

Li **WERTE** : B.O) KHT6/n OPOXOBOH/3 APR (SOVÛETISTAN)

Li **SPIILKA**, bombeyên ku ji şîfî hatine, û li **YAGSEMER** û **MELEKAN** bombeyên ku nayên nasîn....

Netewek bi biryar dijî nijadparêziya **Baas a Saddam Huseyn** ji bo rûmeta xwe û rizgarkirina zewiyên xwe xwe diparêze. Lê gava ku ez ji vê navçeyê di dawîya 1987 de bi têtîniyên xwe vegeyîyam, min "Rapport 1987" a **Amnesty International** kêm dît : bitenê sê rûpel (257-259). Eger **Amnesty** rastiyê jî gotibe çawa dibe ku meriv çewsandineke, **nijadkujiyeke** (qetliam) ewha barbar di sê rûpelan de wasf bike ?

Ez dirodalsa (mubalaşa) nakim gava ku ez dibêjim ku ev çewsandin e. Rejîma **Baas** ji **3.000 gundên kurdî** bêtir, ji destpêka şerrê **Îran** û **Iraqê**, **têk dan**. Wê **Kurdên** ku li navçeya **Bakur** rûdinên neçar (mecbûr) kir ku derkevin **Dîwanîyê** li **Başûr**, û wan mehkûm kir ku di **KAMPÊN** ku li vî bajarî hatine ava kirin de kar bikin.

Bi ser de jî, ev rejîm xwe amade

dike ku **260.349 kes** ji **Suleymaniê** - li **Bakur**, li **kampan** - **sirgûn bike**. Li **hemberî** vê **yekê jî**, ew **derhatiyên gelek paşverû** yên **Misr** û **Sûdanê** bi **cih** dike û **çekan** dide wan. Di sala 1987 de, **200.000 Kurd** **revîyan** **Îranê**.

Ji bo ku ez vê **şehadetê** dirêj nekim, ez **gotinên Doktor TIRYAN**, **yek** ji **14 doktorên bidîplom** yên **vê "navçeya mirî"** **werdigerînim** : **Bi rastî**, **meriv** **dikare** **bêje** ku **ji aliyê hêvî** û **gengaziyên** (**wasite**) **jî** **meriv** di **sedsala 19mîn** de **ye !!!**

Ez dirodalsa nakim jî gava ku ez dibêjim ku ev **nijadkujiyek** e. Ji 1984, ji **3.000 girtiyên rêzanî** bêtir di **girtîgehên** **rejîma Baas** de **hunda bûn** û di **nav** wan de **338 zarok** û **208 kesên** ku **ji 60 salî** **bêtir** in hene. Di **dawiyê** de, **gelheya kurdî hemî dêr** û **cîgehên dîrokî** ku **ji aliyê şareyariya** (**medeniyet**) **Aşûr** **hati** **bûn** **ava kirin** **hunda dike**. **Nîşe** :

Dêrmarodiso, li **Amadyê**.

Samoya piçûk, li **Bîbad**.

Malgoris, li **Merskî**.

Marûdîsû, li **Deredares**, û **hwd....**

Lêgerîneke **dawîn** **dixwaze** **isbat** **bike** ku **rejîma Baas a Saddam dîn bûye**; **têr** **dike** ku **meriv nêrînekê** **bavêje** **ser jima** **ra bermîlên petrolê** ku di **ROJEKÊ** de di **vê navçeyê** de **tên derxistin** : **ji 310 bîran**, **1.853.000 bermîl** di **rojê** de (li **nexşê binêre**).



Tevgera rizgariya Kurdistanê ji bo zewiyê xwe yê ku ewqas dewlemend de ku tê mêtin têkoşînê dide. Loma, bê gûman, divê ku ew nasyonalîst û pragmatîk be, lê jê re nemaze piştgiriyeke netewî û navnetewî pêwîst e. Ew jîna xwe ya aborî (iqtisadî) bixwe temîn dike û ew tradîsyonalîst e, ji bo ku ew xwe dispêre dîtinên netewî yên cihê. Ew ne bitenê hêzeke leşkerî ye, lê civakera hemî gelhê li dora amanceke tenê

ye jî. Meriv dikare bêje ku tevgera rizgariya Kurdistanê alternatîvekê ji destelata (iqtidar) rêzanî ya îroyîn re pêk tîne. Ew dengê avakirina civakî û netewî ye.

Xuya ye ku tevgera rizgariya Kurdistanê ji dîroka xwe baş fêr stendiye, nemaze ji bo ji nuh de yekkirina ~~pênc~~ partiyên nasyonalîst û ajotina wan ber bi koordînasyoneke dêmokratîk, konferanseke netewî û hwd....



NEXŞEYA BIKARANÎNA BÎRAN LI BAKURÊ IRAQÊ

| C I H | JIMARA BÎRAN | JIMARA BERMÎLAN/ROJ |
|----------------|----------------|----------------------|
| HENCIRAN | 32 | 175.000 |
| KOTAN | 38 | 200.000 |
| KOSKAYA | 24 | 185.000 |
| HAWANA | 18 | 185.000 |
| SARALO | 14 | 200.000 |
| SERBESAH | 20 | 64.000 |
| SORAV | 5 | 110.000 |
| BAY HASAN | 72 | 100.000 |
| SENAQA | ? | 92.000 |
| DAVOTKORKA | ? | 112.000 |
| ÇIYAYÊ BOR | 22 | 70.000 |
| CEMBURULA JOR | 70 | 160.000 |
| CEMBURULA JÊRÎ | ? | 200.000 |
| <u>HEMÎ :</u> | nêzîkî 310 bîr | 1.853.000 Bermîl/roj |

BANG JÎ CIHANÊ RE

Nijadkujiya Halabca divê ku bala me ji nijadkujiya ku li aliyê din ê sînorê dibe dûr nexê. Ne bitenê hikûmeta Iraqê çekên şîmîk avêtin ser Merîvan û navçeyine din ên Kurdistana Îranê, lê hikûmeta Îranê jî her roj Kurdan dikuje, gund û bajarên wan têk dide

û bi hezaran kesan singûn dike û bê war dihêle.

Em li jêr du bangên Kurdên Îranê ji cihanê re, ku di 22.12.87 de hat çap kirin, weka xwe, bi fransîzî, diweşînin.

DEMANTELEMENT DU KURDISTAN D'IRAN

Khomeiny poursuit inlassablement sa répression au Kurdistan d'Iran: bombardements des villes et des villages, massacres de civils, femmes, enfants et vieillards, emprisonnements et tortures, blocus économique, paupérisation, famine, maladie et incitations à la criminalité...

Périodiquement, et le plus souvent en plein hiver, le régime se livre à la déportation des habitants de villages de haute montagne, et des villages aux frontières de l'Irak. Lorsque le village est évacué, le régime de Khomeiny rase et brûle les habitations et les récoltes. De ce fait des régions entières sont dépeuplées et anéanties.

C'est ainsi qu'en octobre dernier 800 familles, soit environ 4000 personnes vivant dans vingt-quatre villages de la région de Bolfat ont reçu l'ordre de quitter leur village et d'"aller où ils veulent" et durant ces deux derniers mois, dix villages de la région d'Alan ont été incendiés.

Nous faisons appel aux instances internationales, à l'O.N.U., à la presse internationale, à toutes les organisations humanitaires de faire pression sur la République Islamique d'Iran pour que cesse cette politique d'extermination, et nous sollicitons une aide concrète pour les milliers de réfugiés kurdes qui errent dans les montagnes enneigés du Kurdistan.

Association culturelle et sociale franco-kurde

Paris, le 22 décembre 1987

Au secours du peuple kurde d'Iran

La guerre menée par le régime de Khomeiny sur le sol du KURDISTAN d'IRAN a causé d'irrémediables dommages. Les offensives militaires contre la population kurde, les massacres de paysans, les déportations de villages complets, les emprisonnements, les tortures, les condamnations à mort et les exécutions sommaires de jeunes Kurdes se multiplient.

Plus de cinq mille familles, soit près de 30 000 personnes, ont été contraintes de fuir villes et villages. La plupart d'entre elles se sont réfugiées dans les régions libérées par la résistance kurde où elles vivent dans le dénuement. Les offensives répétées du régime contraignent ces réfugiés à une fuite incessante.

Ces réfugiés n'ont pas de camp fixe. Ils sont dispersés dans les vallées et les montagnes où, dans des conditions inhumaines, ils vivent sous des tentes de toile ou des abris sommaires, alors que l'hiver au Kurdistan est particulièrement rude. Ceux qui réussissent à trouver refuge dans un village provoquent des problèmes de surpeuplement qui dégradent les conditions d'hygiène et de santé. La pénurie de vivres et de vêtements entraînent une inflation galopante, multipliant les prix par dix ou quinze.

La situation la plus préoccupante est celle des enfants. Ils sont sous-alimentés et privés de soins, ce qui augmente le taux de la mortalité infantile. De plus, leur scolarité est des plus précaire.

Vous pouvez aider ces réfugiés.

Adressez-vous au **KURDISTAN SOCIAL AGENCY**
Chez A.F.K
B.P. 102
75623 Paris Cedex 13
Téléphone: (1) 45.89.04.30

et envoyez vos dons au **C.C.P. Paris 680-40 M020**

Nous vous remercions de tout ce que vous pourrez faire

Kurdistan Social Agency

Paris, le 22 décembre 1987

ZÎNDANA DİYARBEKİRÊ

Derwêş

Liberxwedana girtiyên Diyarbekirê di 5'ê Sibatê de dest pê kir û bi peji-randina (qebûlkirin) piraniya 30 daxwazên wan di 19'ê Sibatê de qediya. Liberxwedanê bi awayê grêva birçîbûnê çêbû û biserket.

Yek ji daxwazên wan yê sereke bi merivên xwe re axaftina bi zimanê kurdî bû. Weka ku tê zanîn, zimanê kurdî jî, weka pîr tiştên din, li Kurdistanê qedexe ye. Kesên ku bi tirkî nizanî bûn, nikarî bûn bi xwediyên xwe yê girtî re bipeyivin. Ev qedexekirin bû sedema sereke ya vê grêva diyar.

Serekwezîrê Tirk Ozal, di 18 Sibatê de, di beyaneke xwe de da zanîn ku wî piraniya mercên (şert) girtiyên Diyarbekirê pejirandiye û axaftina bi kurdî jî yek ji wan daxwazên ku wî pejirandî bû. Bi vê yekê girtiyên grêva xwe rawestand.

Piştî ku vê grêvê dest pê kir, girtiyên zîndanên bajarine din jî vê yekê kir. Û li derve, du parlamenterên kurd, Adnan Akman, ê Mêrdînê, û Mahmut Agînak, ê Karsê, ji bo piştgiriya wan grêva birçûbûnê kir. Komîta xwediyên girtiyên jî civîneke çapê bi kurdî çêkir.

Lê, mixabin, yek ji girtiyên, Mehmet Emîn Yavuz, ku ji dawa P.K.K. hati bû

girtin, di grêvê de mir. Serketina girtiyên bi şahî hat pîroz kirin, lê mirina M. Emîn Yavuz hemî kes xiste şînê (matem). Cenaza wî çû Hîlvanê.

Serekê Şaredariya (belediye) Diyarbekirê yê kevn Mihdî Zana di roja 22 Sibatê de li ser vê yekê di dadgehê (mehkeme) de axaft, rewşa girtiyên û diwariyên ku ew tê de dijî bi awakî vekirî rohnî kir û namekê ji dadgehê re nivîsî ku ew bilez mercên wan bipejirîne û biryar li ser wan bistîne. Wî, di axaftin û nivîsa xwe de, îdara girtîgehê, ku biryaran bi serê xwe û li gora keyfa xwe distîne, mahkûm kir û mirina M. Emîn Yavuz xist stuyê wê.

Piştî liberxwedana girtiyên, pîr kesian serketina wan pîroz kir û revîn girtîgehê. Dost û heval û malî tev bi hev re bi zimanê Kurdî diaxiftin û derd û kulên xwe ku ji salan û vir de nikarî bûn ji hev re bêjin wê rojê gotin. Kurdî serbest bû. Bi vê yekê jî Diyarbekir careke din navê xwe di dîroka serhildanên Kurdistanê de da nivîsandin.

Lê, mixabin, weka her gav, Turgut Ozal, ji soza xwe vegeriya û bitenê islahatên piçûk anîn cih. Giraniya rewşa girtiyên gelek siviktir ne bû. Û liberxwedan ji nuh de dest pê kir....




RAPPORA AMERÎKÎ LÎ SER KURDÊN TIRKIYÊ

Di Sebata 1988 de, Dêpartmana Dewletê ya Amerîkî rappora xwe ya salî ya 1987 li ser mafên mirovî li hemî cihanê weşand. Di vê raporê de, pişkek (fasl) li ser pelixandina van mafan li Tirkîyê heye. Û di vê pişkê de, di benêke dirêj de, ev rapport hemî zordestiyên ku li ser Kurdan dibin dijimêre û ji hikûmeta Tirkîyê dixwaze ku ew "mafên hindika-

yiya netewî ya kurdî" bipejirîne (qebûl bike).

Dema ku Amerîkaya ewqas bihêz û hevalbenda sereke ya Tirkîyê vê yekê îlan bike, em xwe nexapînin û nebêjin ku wê rêzana (siyaset) xwe guhertiye. Tiştêkî tenê vekirî ye : Gelê kurd ewqas dikişîne û ewqas xwe diparêze ku îcar tu dewlet nema dikare doza wî ya rast û bixwîn inkar bike.



TURKEY

Section 5 Discrimination Based on Race, Sex, Religion, Language, or Social Status

Kurds may be found in every area of Turkish life and at all levels of society. But the Government remains adamantly opposed to any assertion of a Kurdish ethnic identity and has taken a number of steps to suppress it. Publication of books, newspapers, and any other materials in Kurdish is forbidden, as are books or any other materials in Turkish dealing with Kurdish history, culture, or ethnic identity. Use of the Kurdish language is not permitted for any official purposes, e.g., in the courts, nor is it allowed in certain private situations such as receiving visitors in prison.

R Ê W I Y Ê M I R Î

Şahîne B. SOREKLÎ

Mirî ji gorên xwe derketin û dengên wan kete nav bayê bakur. Li jor ewrên êzmên li hev qelibiyên û bû gurme-gurma tavan. Şêrko di şûna xwe de ji tirsan hişk bû, çongên wî sist bûn û nema dikaribû gavên xwe pêşve bavêje. Bi nişka ve brûskê goristan bîstekê ron kir û yên mirî ji Şêrko ve dane xewindandin.

- Metirse, xorto, metirse! Tenê bibêje bo me, ka çawa ye rewşa yên me, ka li welêt çawa berdewam e jiyân?

Û Şêrko destên xwe ji hev vekirin, ber bi jor hildan, bi çîlikên baranê yên sar şil kirin û bi tiliyên xwe lêv û zimanê xwe, yên ji tirsê hişk bûbûn, şil kirin û xwe da hev bo bersîvekê bide pirsê şênîyê goristanê.

- Mirîno! Hestiyên we di goran de bila li ser jiyânê nelerizin. Jiyanê yên we, ew jî babetek ji babetên mirinê ye. Tenê mirina wan li bervacaya ya we yeke bi êş û janê dagirtiye. Mirîno! Heke gotina pêxemberan rast derket û rojek hat, hûn tede bo jiyaneke nû û bê dawî ji gorên xwe rabûn, wê demê di meşa xwe de serên xwe ji şermê nizim daxin, ji şerma miriyên xwe yên îroj li dervayê goran dijîn. Mirîno! Mirina we ya giyanên we ye, lê ya me, ew mirina hebûn û serfiraziya me ye, ya merovtî û kîbûna me ye. Em wek leymûnên ku ava wan ji wan hatiye guvaştin in, em wek guhanên miyên tî û birçî ne ku şîr ji wan hatiye dotin, em wek darên bê pel û ber in, em wek ewrên bê baran in, em wek şevên bê hîv in, em wek mêngên bê gîha ne; mirîno, em ji we mirîtir in, ji lewra hûn tenê mane hestî; em xwedan can û giyan in, yên ku ketine binê lîngan; li ser we xweliya xuristê ya pak e, li ser me şerm û gemara salan. Ewên di nav we de derewîn bûn rojekê, nema êdî dîkin viran, lê di nav miriyên we yên li dervayê goran de hê hene vîrekên bi hezar û neh sed

û nod û neh reng û şêwe û babetan. Mirîno! Şûna çavên xwe tiji xwelî kin; dema em di rex gorên we re derbas dibin, bila em ji kortikên çavên we re nebin îhanet. Şûnên perdeyên guhên xwe jî tiji herî kin, bo emên ketinî bin destên efareya merovtiyê ji şûna guhên we re nebin serhevde. Mirîno! We li rewşa kesên xwe yên dijîn pirsî. Ewana di navîna pirêziyên xwe de bê sap û arvan hatine hiştin; bi milyonan ji wan dest ji zeviyên xwe berdane û hêviya xwe tenê kirine reva nav zeviyên biyanîyan, bo xwe di nav yên din de bidin fielandin....

Miriyan nema xwaztin ji Şêrko bêtir bibihîsin, serên xwe kirin ber xwe û li gorên xwe vegeyan. Ber ava baranê gorên wan li ser wan tiji bike, wan bi xwe kortikên çav û perdeyên guhên xwe tiji xwelî kirin û berên rûyên xwe dan êrdê.

Îroj miriyên welatê me hemî bi rû di êrdê de ne ji şermê. Miriyên stana me nema êdî ji gorên xwe tîyên der, ta ji wan tê xwe bêtir di kûraniya goran de ber bi jêr dadixin.

Û Şêrko car din bi rê ket. Drêj nekir, dema hat bîra wî, ku navê wî ne Şêrko ye. Navê wî Alî Oztürk e, yan heye ku Neşet Mühyiddin e; wî bi xwe jî nema êdî navê xwe yê rast dizanibû.

Bi rohilata roja li pêş re rêwî hev-dîtina xwe û şênîyê goristanê ji xwe bîr rakir, yan wisa xuya dikir. Ti caran ji devê wî derneketin bêjeyên li ser wê serpêhatiyê, lê ji wê şevê û şûnve ew nema êdî diwêribû di ber goristan re derbas be, ne ji tîrsa cin û neysizî û cinawiran, lê ji tîrsa pirsên miriyan.

(Sydney: 1/88)

H Ê K

A. NEQŞEBENDÎ

Li Kurdistanê, hêşta rez û bax û gundên Kurdan nehatbûne sutandin û wêran kirin û berî xucihên van gundan veguhêzin û bibene cihên dwîrî welatê wan, feqî (mêwe) û diramet, pez û rêçal, mirîşk û hêk hind di mişe bûn kesê ne di xwarin û ne di zanî çî lê biken, xasme rêkên maşîna tune bûn. Ji ber vê egerê, ev verrêja hinde bi bihna hemî di cihda di ma û bi herwe di çû. Ev giriftarya han li dilê çî Kurdekî xuş ne di hat, tinê dewar bi vê êkê şad û dilxuş di bûn, ji berku li cahî stirî û gîyayê hişk alîka wan bi bû sêvên emrîkî û gele nifşên din yên fêqî.

Li dwîr dikûmentek aburî, tinê deverekê ji Kurdistanê jêrî şîyana hindê hebû ku fêqî bû welatekê du caran hindî Elmanya Fidirralî berhev biket. Lê niha û piştî biyanya ev giriftarye kişandîye ser milên miletê kurd, ev tiştên han yên bûyne daxwaza nexuşa û tunene.

Lew demê ez bi kutekî û ji neçarî ji welatî derkeftim û hatime Elmanya û mişeya van tiştan min dîtî, bîra min Kurdistanê û jîna Kurdan di destên bîyanyada hateve û min di gute deyka zarroyan :

- Hêvkê, heke wekî caran gundên me di ava ban û em wekî miletên dinê xuyên welatê xu bayin, niha wekî Elmanya bajêrên me jî di pêşkeftî û di tijî tişt ban, çedbû jî em ji wan çêtir bayn. Ji berku gelek ji van tiştan Elman bû xu ji welatên din di iynin, lê me bi xu evne hemî hebûn. Ji ber vê çendê wekî wî zarroy li min hatbû yê di zarrokînya xuda dilê wî çûye tiştêkî û ew tişt tune, vêca heta mezin jî di bît ew kovan her di dilî da di mînît. Lew ya dilê min di xwast, min di gut û ya dilê min di vîya û di çuyê min di kirrî. Rojkê ezê di xurkumana xu û hizrên welatîda bûm, di bînim deyka zarroya gazî min kir û gut :

- Were hevke xuyê maşîna he, ya lijî

hêk, mal-mal yê di çî û yê hêka bû di danît. Tu jî bûçî naçî bêjyê bû me jî bînît, ez di bêjim dê ji hindê baştir bît ku em ji bajêrî bikirîfn.

Ev gutne gele li dilê min xuş hat, lew min zwî bersiva wê da û gutê :

- Eve hizreka pirr baş e, wehaye jî ji yên bajêrî erzantir bin, ji berku li Kurdistanê heke mirov tiştêkî ji dest bi kirrî, yan jî wî kesî bi kirrî yê bazarrê ser pê diket, bû mirovî erzantir di kevî ji yê xuyê markitê û bi lez ez derkeftim û çûme nik xuyê hêkan.

Min bi ingilîzyeka şaş di gel axift, lê wî bersiva min ne da. Min ne zanî egera wê xutênegehandinê çî bû. Lew ez neçar bûm bizava hindê bi kem, bi elmanî di gel baxvîm, herçend bû min çî ji zimanê elmanî ne di zanî.

- Bite iyş muşte iye.

Xuyê hêka di min gehişt ku ezê di bêjmê, min hêk di vên. Ji berku wî êkser kartuneka hêka da destê min. Min jî jê wergirt û paşî gutê :

- Iyme vux iyş muşte iye, und des iyst mayne hewze û min destê xu bû sirta mal dirêj kir. Wî jî berêxu da min û di bin lêvên xuve kire kenî û gut :

- Okey.



Bi rastî ez gele dilxuş bûm, ji berku ez wesana di xû geştişim ku ezê hwî buyme zimanê elmanî. Paşî min destê xû da bîst marka û davê. Wî jî ji min wergirt û hinde hwîrde da destê min û gute çûz. Ez jî bi dilekê xuş zivrrîmeve mal û her li ber derî min gazî deyka zarroya kir û gutê :

- Hêvkê eve min hêk iynan û min gutê jî hemî heftîyekê me di vên û bû me bîne, wî jî gut başe.

- Başe te çewan gutê û têgehand, tu zimanê elmanî nizanî ?!

- Raste ez elmanyê nizamim, lê ez têra xuyê hêka di zanim. Bi serê te min bi elmanî gutê û gele baş jî di min geştiş.

- Dê bila, lê te ne zanî bihayê wan çend bû û çend ji te wergirt ?

- Bi rastî min ne gutê û bazar nekirin û min ne berêxû dayê jî kanê çend ji min wergirtîye. Min bîst mark danevê û wî jî ev hwîrde da min. Hanê bi hijmêre kanê çend ji min wergirtîye.

Min bermayê para kire destî û ez rwîniştim. Wê jî hêvkirê û hijmartin, paşî di bînim kire kenî û gut :

- Eve çend ji te wergirtîye ?! Dîyare eve hêkên sîmerxanin hinde di giran ! Berêxû bidê ew parê ji te wergirtî, dê li bajêrî du caran hindî van hêka pê kirrîn.

Min ev çende gele pê nexuş bû, ji berku heke rast bît û bihayê wan hinde bît û ez ne xapandibim, ev hêke gele di giranin, xasme bû êkê wekî me mişext. Paşî min zwî mesela xapandî û di serda birnê ji hizra xû bir û havêt. Ji berku min bawerî hebû ku Elman tiştêkê huyê nizam di gel me naken, xasme em mêhvanên wanin û di zanin çî giriftarî ya bi serê me hatî. Paşî ez li deyka zarroya zivrrîm û min gutê :

- Başe ka dê were bêje min, heke carek din xuyê hêka hateve em dê çî bêjîne ?

- Ma dê çî bêjîne, bêjê êdî me hêk nevên û bû me ne iyne.

- Ez di zanim êdî me nevên, lê dê çewan bêjmê û têgehînim !

- Bi elmanî bêjê, te berî niha ne di gut ez têra xuyê hêka elmanyê di zanim, vêca bi wê elmanya tu di zanî, bêjê êdî bû me ne iyne.

Piştî vê gutnê min axiftin nema û ez hiş bûm, ji berku rast e, berî bêhnekê min sîngê xû iynabû derve û nav di xû di dan û di gut, ez elmanyeka qenc di zanim. Dê panê min ya kirî û divêt ez çarekê bû bi



bînim, lê bila ev xeme bû wê rojê bît ya xuyê hêka di hêt.

Çend rojek pêve çûn û me giriftariya hêka jî bîr kir. Rojekê êkî zengula xanî lêda, ez jî bêy bizanim çî kese, min dergeh vekir. Di bînim xuyê hêka yê li beramberî min û kartuna hêka da destê min û ji nwfî silav kir. Bi rastî min şerim kir hêkên wî bû bi zivrrîmeve, lew min parê wî dayê û bi elmanîya xû gutê :

- Iyşe tenke, aba vîrniştê sin iya.

Min bi destan jî harî xû kir ku têbigehînim û bêjmê, bira gele sipas û êdî me hêk navên û bû me ne iyne. Wî jî wekî cara berê, berêxû da min û di bin lîvên xûve gurrnîjî û gut : okey.

Ez bi hêkve çûmeve jûr û berî deyka zarroya çî bêjît û baxvît, min bi kenîve gutê :

- Hêkên vê carê ji cara berê mezintirin, dîyare jî xuştirin. Paşî em dê wesana girîn me ev pare yên berze kirîn, ji berku her ev careye û êdî xuyê hêka nahêteve û min baş gutê û têgehand û wî jî gut başe.

Herçend bû min eve di gute deyka zarroya, lê min bixû bawerî nebû ku xuyê hêka baş û baş di min geştiş. Lew ji wê rojê wêve, tirsê hêka kete hinavên min û hindî roja hatna wî nêzîk dibû, ev tirsê han li nik min mezintir lêdîhat. Lê ev çende min bixû ne di iyna derê û xû bi serve hay ne dida û ne di gute deyka zarroya.

Roja hatna xuyê hêka ez li ber pencerê bûme nubedar û keşikçî. Di nişkêda min dît maşîna wî li ber derî rawestîya, her çavên min çûnê û min li deyka zarroyan qîrand û gutê :

- Eve xuyê hêka yê hat, heke zengula

derî lêda derî lê veneke û were xu mitke û bêdeng rwîne, weheye wesana têtbigêhît ku kes li mal nîne û bêhîvî bi bît û bi zirrîteve.

Di van axiftinada zengula malê lêda, lê em ji cihê xu ne rabûyn û me xutênegehand. Min wesana bêhna xu çik kirbû hind buy bêhinkurtkê ez girtîm. Carek din, zengul hate lêdan, lê disan me xu bi serve hay neda, lê min zarroyekê hey çî zimana nizanît, her gava wî dengê zengulê gulê buy, xu ji nav destên deyka xu havêt û bi dengê bilind gut :

- Mamo... mamo... mamo.

Min zanî xuyê hêka gul dengê zarroy bû, lew min dît tiştê ne yê dirust ez derî lê venekem. Ji ne çarî û bi wan ser û dilave min dergeh lê vekir. Lê vê carê gava ez derkeftîme derve û beramberî xuyê hêka rawestyaym, min her du destên xu dane pişt xu, da wekî cara berê zwî kartuna hêka ne kete di destên min da û berî baxvît min bi kurdî gutê :

- Bira ez hivî dikem êdî hêka bû me ne iynî, em hêka naxuyn, ji berku li Kurdistanê şermeka gele mezine heke êk hêka bixut, li vir jî nûjdarî ya gutye min nabît hêka bixuy. Zarroyên min jî heku hêka di bînin dilê wan têkel dibît û pîstê leşê wan di xuryêt. Ji ber van egerê em û hêk jêk nagirîn, yan baştir bêjim em dijminên hevîn. Babû ez ketme ser bextê te êdî hêka bû me ne iyne.

Ez herê di bêjim û xuyê hêka herê serê xu di hijînît, pasî xu çemand û kartuna hêka dana ber pêna min û li hîvya parê xu rawestyay. Min jî ji nedilî xu parên wî kirne destî û ew çû ser rêka xu û ez jî zivrrîmeve jurve.



Evan hêka ji bilî hindê ku di girana bûn, giriftaryeka dî bû min di malda çêkir. Sipêdê û nîvru û êvarî, hersê danên rojê xwarna min bûne hêk û li şwîna hindê bêjim ez naxum, min di gute deyka zarroya :

- Tu di zanî hêk xwarneke gele xuşe, û çî tiştê wekî hêkê vîtamîn têda nînin, jîyê mirovî jî pê dirêj di bît. Wê rojê min di rojnamekêda xand ku hêk pîstê leşê mirovî nerim diket û gele jin şwîna şampuy û sabîne bi hêka serê xu di şûn û di bêjin hêk pirçî nerim û dirêj diket.

Bi awayekê wesana tîrsa hêka kete dilê min êdî di hatne xewna min û bi şevê tayê ez di girtim, ne bi şeve û ne bi rojê hizra hêka ji serê min dernediket û hindî min hizrên xu di kirin ku çarekê, rêkekê bû vê giriftaryê bi bînim, min çî rê ne di dîtin. Gele caran hizra min di çû hindê ku em çend rojeka ji mal biçîn, şayd xuyê hêka wesana têtbigêhît ku em li cihê xu ne mayne û me ya bar kirî. Lê min ne di zanî kîve biçim û polîs jî rê nadete min ez ji vî bajêrî derkevîm. Bi vî awayê min heftêya xu bûrand û bû roja hatna xuyê hêka. Wê rojê sipêdê zwî li beramberî pençerê li hîvya maşîna hêka rwîniştîm û gav bû gavê lêdana dilê min bi leztir û bilintir lêdinat. Gavekê min dît maşîna peyda bû, her çavên min çûnê û ez di bin zarroyê xu helçûm û min bir kîre di serşuyêve û li deyka wî qîrîrand û gutê:

- Zwî hinde şekruka bidê û dergehî lê bigre û were harî min da perdên pencerê berdeyn û bikeyne tarî, eve xuyê hêka yê hat. Ronahya jî vemirîne û were xu mit bike, heke vê carê dergehî jî bişkênît ez lê venakem.

Zengula xanî hate lêdan, di gel dengê wê dilê min wesana xu helavêt, min gut ha-ha dê ji nav pîrasyên min derkevît. Me wesana mal çik kir bû û xu bêdeng kirbû me guh li lêdana dilê xu hebû. Xuyê hêka jî her zengul lêda û lêdave, min jî her di dilê xuda di gut : lêde yaru qîrar bît, suz bît, tu hemî hukmeta elmanî bînye pişt dergenî ez derî li te venekem. Heyamekî me xu di jurve ragirt di bînin zengul rawestyay û ne hate lêdan û çî pêjin jî ji derve nahên, dê dîyare bêhîvî bû çû û em di bergirya xuda bi serketin. Bi awayekê nepenî min di pencerêra berê-xu dayê di bînim maşîna wî jî li wêrê nemaye û ya çûy. Lê heta êvarî jî ji tîrsa zivrrîna wî min xanî hêla tarî.

Heftîyek çû, du çûn, se çûn, xuyê hêka peyda ne bû, nexêr sengîya hêka ji ser sîngê me rabû.

Rojekê nêzîkî nîvruye hêsta ezê di xew û nivistîme, deyka zarroya hera di hêt û di çît û pite-pita wê ye û ya di bêjft :

- Eve nîvruye hêsta tu yê nivistî, dê rabe heke niha kesek bihêt dê çi bêjft !

Ez jî herê di bêjmê : dê bela xu ji min veke, bihêle buxu binvim, bawer bike ez şivêdî ne nivistîme, paşî rabim çi bikem ! Kar, kiryar, xandin, min çi heye ?! Gavekê min hind guhlêbû deyka zarroya ya di kete hewar û ya di bêjft :

- Hilu... Rabe eve xuyê hêka yê hat.


Her min navê hêka gulê bû û xewê leşê min berda û bejnekê ez ji nivînên xu bilind bûm û min kire hewar û gut :

- Perdên pencera berde. Zarroyê xu bibe di serşuyêve û derî veneke. Yan baştir kanê çequyekê yan saturekê bû min bîne û tu jî darê henê rake û ne hewe : bila destan li serxu helînîn.

Ezê di bêjim û wekî mirovekê ba bi serî ketî û gêj buy, herê li dur xu di zivrim. Lê gavekê berêxu di deme deyka zarroya, di binim ya rwîniştîye û ji cihê xu narrabî. Min jî gutê te xêre tu nabizivî, rabe dê niha hêt : di bînim kire kenî û gut :

- Ne tirse, xuyê hêka ne hatye. Min eve gute te da ji xew rabî.

Ji xuşya hindê ku xuyê hêka ne hatye, min jî berda kenî.



DÎROKA KURDÎSTANÊ DÎ

- XII -

IV- C i v a k a k u r d î (3)

B- A L I Y Ê O L Î

Civaka kurdî ku li ser zewî "erd" (êl û gund) û xwîne (malbat) ava bûye, bi alîkî olî (dînî) ku gelek caran di jîna rojî de xuya dibe rengkirî ye (li Th. Bois, *L'âme des Kurdes*, 47-8 binêre). Navenda bicihbûna kurdî ya îoryîn, ya Rohilata Diclê, li dora Golên Wan û Urmîyê û ya Bakur û Rohilata Iraqê, berê Islamê perçeke ji

imperatoriya sasanî (224-642), ku tê de zerdeştî bû bû ola Dewletê, bû. Lê, berê jî, di dema Partan de, keşşeyên fille tê de rastî komên cihû (yehûdî) bû bûn û li hemberî wan gelheyên "kafir" ku ji daran re ibadet dikir, ji rojê re limêj dikir û ji şeytan re qurbanan pêşkeş dikirin derketin. Hin ji wan bûn misilman. Di *Les Actes des Martyrs de Perse* de (weşana sîryak Bedjan, Leipzig 1892) tiştên ku van fillan di bin Sapor II (309-363) de kişand tên wasf kirin. Lê, di destpêka sedsala Vmîn de, Dêr xwe ji nuh de saz kir, keşşe li herderê welatê kurdî bi cih bûn (li Labourd, *Le Christianisme dans l'Empire perse sous la dynastie sassanide "224-632"*, Paris 1904 binêre) û dêrên ku hin ji wan heta vegirtina (işgal) Tîmûrlenk (1336-1405) man karî bûn bîn ava kirin; li Fiey, *Assyrie Chrétienne* binêre. Lê girseya (kitle) gel ola fermî digirt, û Kurd itiraf dikin ku dibe ku pêşiyên wan mecûsî yan ji mezhebeke zerdeştî bûn (Sykes, *The caliphs' last heritage*, 424).

Ketina qraliyeta sasanî (642) rê da misilmankirina welatê ku Ereban ji deh salan de dest bi vegirtina wî kiri bû. Ev yek ne bê lihevexistin û ne bê poşmanbûn çêbû. Lê piştî gelek şerrên ku wan tê de carna aliyê sunniyan û carna aliyê xarîciyan girt, Kurd di dawiyê de bi tevayîya xwe ola nuh girt. Kurd bûn misilmanên sunnî û ew hema hemî şafiî ne (m. 204/820), weka ku Şerefname (I, 14) û Ewliya Çelebî (IV, 75) goti bûn.

The Nestorians and their Muslim Neighbors

*A Study of Western
Influence on their Relations*

BY JOHN JOSEPH

*

PRINCETON, NEW JERSEY
PRINCETON UNIVERSITY PRESS

1961

(*) Encyclopédie de l'Islam, 1981, Paris. Wergerandin, fransizî-kurdî: Pervîn.

Di dirêjayiya dîrokê de, serokên kurd hestekî (hiss) germ ê olî nîşan da, bê ku regezê (unsur, faktör) netewî bikeve navê. Em bi Selaheddîn (1137-93) dest pê bikin. Wan derbasbûna xwe bi avakirina mizgeftan, dibistanan, nexweşxanan yan kaniyên piçûk nîşan kir (Şerefname, weşana Qahirê, 96-7). Li ba van avakeran, çîneke (sinif) ronakbîran (ulema û fuqeha) xwe dida fêrbûna olzaniyê (ilmê dîn) û huqûqê. Bi vî awayî, em dikarin "medrese"yên navdar ên Bitlîs (Şerefname, 455, 495), Cezîre (berhem bixwe, 171) û Zaxo (berhem bixwe, 147) bijimêrin. Li Axlatê, yek ji zanayên wê di avakirina birca têdîtina stêrkan a Maraşa de, di sedsala VII/XIII mîn de, xebitî (berhem bixwe, 409). Amadya jî navendeke ku bi zanayên xwe navdar e (li Damlûcî, Imarat Bahdînan, 59-61; El-Abbâsî, Imarat Bahdînan binêre). Li Zanîngeha binav û deng a El-Ezher li Qahirê gelek Kurd, weka mamosteyên olzaniyê, hene (li Nikitine, les Kurdes, 210 binêre). Li Goristana Eyyûb li Stembolê û ya Skutari Kurdên ku di heyama (dem) osmanî de wezîfa Şeyx El-Islam stendi bûn hene (li Th. Bois, la Religion, 2 binêre).

Li hemberî vî Islamê fermî (resmî), Islamekî dîn ê gelerî radiweste. Ew pirîcar derveyî destelatên (iktidar) medenî û olî dimîne û jîneke geş dajo. Ev cihana xelkên piçûk e : Gundî û hunermendên ku piraniya wan nexwenda ye, celebeke xwendekarên girêdayî tarîqetêke sûfî û şêxekî ku weka rehberê wan ê giyanî (rûhî) ye "murşid". Ji sedsala VI/XII mîn, Sûfî ketin Kurdistanê û tê de pêş ve çûn (li Lescot, Enquête, 23-4 binêre). Îro, tarîqetên sereke ku li ba Kurdan baş bi cih bûne ev in : Qadiriyya ku dibêjin ku rayê (esl) wê ji Ebd El-Qadir El-Xîlanî (1078-1166) ku li Bexdayê miriye û ku bixwe Kurd bû tê, û Neqşebendiyya ku xwe girêdide Beha' El-Dîn ê Buxara (1317-8) û ku li cihana islamî baş belav bûne, nemaze li Hindistanê û heta Çînê. Ev tarîqet ji aliyê Mewlana Xalid, piştî gerrekê li Delhî, di dawiya sedsala XIX mîn de, hat xistin Kurdistanê Iraqê. Ew ji êla (eşîr) Caf bû, li Kara Dağê di 1779 de çêbû û li Şamê di 1826 de mir (li Rich,



Résidence, I, 140-1, 320-1; Nikitine, les Kurdes, 212-5; Edmonds, Kurds, 77-8 binêre). Wî dijîtiyeke xurt ji aliyê şêxên qadirî dît, lê li dawiyê wî cihê çendin ji wan stend. Li Başûrê Kurdistanê, ji xwendekarên terîqeta qadirî re Derwîş dibêjin û yên Neqşebendî navê wan dikin Sûfî (Edmonds, 63). Civînên biratiyê li mala şêx (xankah, tekiyya yan tekke) dibin; ev xanî weka mêvanxane ku tê de şêx sofrê radixe û ji "murîd"ên xwe re fêr dide ye. Lê li her derê ku tê de tekkeke sûfî bi cih dibe, di nav êlekê yan gundekî de, hema bi awakî otomatîkî dijayetî derdikevin, ji bo ku şêx dewlemend e û mal-xweyê gelek gundan e, û bi vî awayî ew dijî axayê êlê, ku wî ji bo destelata xwe weka nahez dibîne derdikeve; û tê gotin ku ew xwediyê mucize ye, loma "ulema" bi çavekî bigûman lê dinêrin ji bo ku ew qet pê bawer nakin; li dawiyê û berê hertiştî, ew pirîcar dixwaze roleke rêzanî (siyasî) bilîze, loma destelatên hikûmetê lê bi gûman dinêrin. Ji aliyê dîn jî, hezkirina murîdan bê sînor e û fanatîzma wan dikare bigihîne gelek xerabiyan. Bi vî awayî, carcaran hin xwediyên xeyalan radibin, xwe "mihdî" dibînin û doza (dawa) şoreşa civakî dikin. Li ser vê


yekê nîşe gelek in (Companile, Storia, 91-3; Nikitine, berhema buhurî, 221; Rondot, les Tribus montagnardes, 43; Th. Bois, L'âme des Kurdes, 52-3; Edmonds, Kurds, 74, 6). Tofeke (kom) nuh a Neqşbendîyan, Nurcular, ji aliyê Seîd Nûrsî yê Kurd (1870-1960) li Kurdistana Tirkîyê hat pêk anîn (li MW, 1960, 232-3, 338-41, 1961, 71-4 binêre). Ketina tiliya şêxan û ya xwendekarên wan, nemaze yê Neqşbendî, di nav gelek serhildanan de, li Tirkîye û Iraqê hatiye dîtin. Hikûmet bi awakî xwînf dijî wan rabûne, weka tevgerên Şêx Ubeydullah Nehrî (1880), Şêx Seîdê Pîran (1925) ku bû sedema girtina hemî tekkeyên sûfî li Tirkîyê, û serhildanên Şêx Mehmûd El-Berzencî (1919 û 1922).

Fêrên hin şêxan, ji bo ku ne şoreşgerî ne, divê ku bi baldan bên guhdarî kirin, weka dibistana sûfî û limêjên Şêx Muh. Emîn El-Kurdî El-Şafîf El-Neqşbendî yê Erbîlê (di 1904 de mir) di pirtûka wî Tenwîr El-qulûb (Ronîkirina dilan) de ku gelek caran hat weşandin (weşana 7mîn di 1961 de) û ku J. Arberry, le Soufisme, Parîs 1952, li ser wê dipêyve, û wergerandina fransîzî ya teknîka wî ya sûfî ya "zîkr" ji aliyê J. Gouillard, Petite philocalie de la prière du coeur, Parîs 1953, 234-48.

Lê ev tarîqetên cihê, li gel diroda-lasayên (mubalaşa) wan û ketina wan nav rêzanê (siyaset), hîn jî weka beşeke tevayî ji Islama rast û fermî tîn hesabandin. Lê mezhebên din ku dozînen (nazariyye) wan êkstrêmîst in nayên pejirandin (qebûl kirin) û ji Islamê derketine, weka Yezîdiyên ku ji Adawiyya ya Şêx Adî Ibn Musafir (nêzîkî 1073-1162) hatine, lê ku rûhanîyeta wê ewqas guherandine ku rayên xwe ji bîr kirine (li Th. Bois, les Yézidis, Essai historique et sociologique sur leur origine religieuse, di Machriq, LV "1961", 109-28, 191-242 de binêre). Bi eynî awayî, tê gotin ku Ehlê Heq êkstrêmîstên şîfî ne. Dr. Moh. Mokrî gelek metnên gûranî yan farisî li ser wan divîsîne, weka L'ésotérisme kurde (ésotérisme : nazariyyên veşartî, sirrî), Parîs 1966. Edmonds lêhûrnêrînekê li ser endamên mezheba sînora Iraq û Îranê, ku bi navê Kakaî hatine nasîn, çêkir (berhema buhurî, 182-201); nivîskar bixwe; The Beliefs and Practices of the Ahl-i Haqq of Iraq, di Iran Jour. Brit. Inst. of Persian Studies, VII (1969), 80-101 de. Meriv îro jî li ba Kurdan rastî hin komikên ecêb li Iraqê tê, weka Sarliyan û, li dora Mûsilê, Şabakên ku Kizilbaşên Kurd in û ku pêwendiyên wan bi Bektaşiyên ku ji berê li Tirkîyê gelek bihêz bûn hene (Edmonds, 268-9).

Çavkanî

Meriv di Nikitine, les Kurdes, 228-33 de, pêşandaneke gelek hêja ya dozînen N. Marr, Eshçe o Slove Çelebi, di ZAP, XX (1912), 99-151 de dibîne; G. R. Driver, The religion of the Kurds, di BSOS, 1922, 197-215 de; Nikitine, les Kurdes et le Christianisme, di RHR, 1922, 147-56 de; nivîskar bixwe, Une apologie kurde du sunnisme, di RO, LWOW, VIII (1923), II, 116-60 de; nivîskar bixwe, les Thèmes religieux dans les textes kurdes de ma collection, di Actes du Cong. intern. d'Histoire des religions, Parîs 1925, II, 415-34 de; nivîskar bixwe, les Kurdes racontés par eux-mêmes, di Asie Française, 1925, N° 231, 148-57 de; R. Rondot, les Tribus montagnardes de l'Asie antérieure. Quelques aspects sociaux des populations kurdes et assyriennes, di B. E. O., Şam, VI (1936), 1-50 de; Th. Bois, La religion des Kurdes, di Proche-Orient Chrétien, Quds, XI (1961), 105-38 de; J. M. Fiey, A la recherche des anciens monastères du nord de l'Irak, di POC, IX (1959) de; nivîskar bixwe, Assyrie chrétienne. Contribution à



l'étude de l'histoire et de la géographie ecclésiastiques et monastiques du Nord de l'Irak, Beyrût, I, II, 1965, III, 1969; Th. Bois, Monastères chrétiens et temples yézidis dans le Kurdistan irakien, di Maşriq, LXI (1967), 75-102 de; D. N. Mackenzie, Pseudoprotokurtica, di BSOAS, XXVI (1967), 170-3 de; J. Spencer Trimmingham, The Sufi Orders in Islam, Oxford, 1971; R. Lescot, Enquête sur les Yézidis de Syrie et du Djebel Sindjar, Beyrût 1938; C. J. Edmonds, A Pilgrimage to Lalish, London 1967.

Metnên olî bi kurdî : Cl. Huart, La prière canonique musulmane, di JA, 1895, 86-109 de; K. A. Bedir Xan, Dersên Şerîfetê, di Kitêbxana Hawarê, 12, Şam 1938 de; nivîskar bixwe, Tefsîra Quranê, sûret I-IV, v. 48, di Hawar,

N° 27-57 de (15/4/1941 heta 15/3/1943); nivîskar bixwe, Hedîsên Cenabê Pêxember, di Hawar, N° 27-47 de (27/4/1942); D. N. Mackenzie, A kurdish creed, di A locust's leg, Studies in honour of S. H. Taqizadeh, London 1962, 162-70 de.


C- ADET Û PEMAHIYÊN CIVAKÎ

1- Cill

Cill taybetiyeke (xusûsiyyet) meriv e. Modaya cillan li gora welat û çîna civakî diguhere (li Libas binêre). Û ew li gora heyaman jî pêş ve diçe. Li ba Kurdan jî ewha ye. Îro cillê kurdî nêzîkî yê Ewropayî dibe, ji bo ku li gora zagona (qanûn) tirkî (îlon 1925) biçe, û li ba Kurdên din ên bajaran, nemaze yên zilaman, ji bo ku li gora modayê biçin. Lê tevayiya jinên kurd û zilamên gundan cillên netewî yên kurdî li xwe dikin. Meriv dikare guhertina cillê kurdî ji çîrokên rêwîyan û nexşeyên ku didin me têbibînin : Campanile (1810) 135-40; Rich (1820), I, 180-1, 287-9; Frazer (1834), I, 71, 85-7 û yan jî Binder (1885), 172 n. I; Soane (1912), 399-402 û Nikitine (1956) wasfên ên berê xwe ji nuh de dikin. Divê ku meriv li benda jinan bimîne ku zanînen hûr li ser cillên nûjen (modêrn) ên Kurdan bistîne. Stî Aristova (1965), 108-26, li ser Kurdên Piştîqef-qasyê dipeyive û hin wêneyên gewherên jinan dide, û Stî Hansen (1961) di pişkeke (fesi) dirêj de (65-98) wasfê hûr ê madde û rengên perçeyên cihê yên cillan dike û çî bi taybetî kurdî ye, çî encama (netîce) adetên islamî ye û çî ji kartêkirina (tesîr) ewropî hatiye pêşan dide, tevî nexşe û gelek wêneyên wan, ji bo ku meriv karibe dîtineke rast li ser cillê netewî yê kurdî yê îroyîn, ê zilam û jinan, bistîne. Gava ku gewherên ji her celebî û ji her madde : zêr, zîv, kevirên gewherî, gerdanlik, bazin, "pandantîf" li ser cillên jinan diçirîsin, serbilindîya zilaman bi çek, rext, pişt û xence-rên neqşkirî û tabancên xurt xuya dibe. Qelûn û tûrika tûtîne jî beşek ji cillê kurdî ne.

2- Adetên dawet û mirinê

Ji dergûşê heta gorê, meriv li herderî hi hogiriya adet yan merasîmên pêmahiyê ku li gora şareyariyan (medeniyyet) diguherin diçe. Li ba Kurdan,



meriv hîn adetên gelek jîndar ku ji dûrtirînen deman de mane dibîne. Bijartina destgirtiyekê, xemilandina wê berê zewacê, buhayê qîzbûnê ku ewê bi poteke bixwîn di şeva dawetê de bê îsbat kirin, derbasbûna şîpanê (devê derî) û ketina mala nuh, şahiya çêbûna zarokê yekemîn piştî zabûneke ku qet ne çîrok e (li A. Brunel, Gulasar. Contes et légendes du Kurdistan, Parîs 1946, 109-11 binêre), hincetên (munasebet) adetên ku ji aliyê hemîyan birûmet (biqedr) in. Em li vê derê lîsteke wan a bi pergal (intizam) û kûrayî nadin, lê çend nîşeyan, li gora navçeyên kurdî yên cihê nîşan didin.

Kurd bi awakî giştî : Campanile, 103-5; K. A. Bedir Xan, La femme kurde, di Hawar, 19/6-8 (1933), 294-6 de; Tawûs-parêz, Le mariage chez les Kurdes, berhema bixwe, 52/12-16 (1943), 764-8.

Kurdên Iraqê : Barth, berhema buhurî, 24-9/29-37; Edmonds, 225-6; Hansen, 115-38.

Kurdên Îranê yên navçeya Urmîyê : Nikitine, 113-5.

Kurdên Sûriyê, yên Şamê û Çiyayê Kurdan : K. Dağestani, La famille musulmane contemporaine en Syrie, Paris 1932.

Kurdên Azarbaycanê : Nikitine, 108-11.

Kurdên Piştîqefqasyê : E. Evdal, berhema buhurî, 22-83 (li Nikitine, di l'Afrique et l'Asie, XLIX "1960", 61-6 de binêre).

Kurdên Alagözê : Ereb Şemo, Şivanê Kurd, Beyrût, 44-7, 114-8.

Kurdên Alamûtê : Freya Stark, La vallée des Assassins, 1946, 270-1.

Kurdên yezîdî : Giamil, Monte Singar. Storia di un popolo ignoto, Roma 1900, 45-9; Isya Joseph, Devil Worship, Boston 1919, 186-91; E. S. Drower, Peacock Angel, London 1941, 17-25, 86; S. Damlûcî, El-Yezidiyya, Mûsil 1949, 276-88.

Kurdên Ehîê Heq : M. Mokrîf, Le mariage

chez les Kurdes, di Ethnographie, 1962, 42-68 de.

Merasîmên mirinê ji yên din ne kêmtir in : şuştina mirî, kortêja şînî yan "kotel", merasîmên şînê û dara mirî "dara şîn", xwarina hevrayî ya sersaxiyê (taziye). Meriv wan ji bo tevayiya Kurdan di van berheman de dibîne : Campanile, 81-6, tevî lawijeke xweş; Nikitine, 115-8.

Kurdên Mukrî : O. Vilçevski, Mukriskie kurdi, di Peredneaziatskiy etnografiçeskiy Sbornik, I (1958), 214-8 de.

Kurdên Tirkîyê : Ahmed Mêrazî, Bîranîyêd min, Erivan 1966, 89-91.

Kurdên yezîdî : Lescot, berhema buhurî, 154-6; Drower, 97-8, 185-6; I. Joseph, 192-3; Damlûcî, 70-2. Funérailles d'enfants, Hansen, 139-43.

Dûmahî heye



NEWROZ, 21'ê ADARÊ YAN 31'ê TEBAXÊ ?

Pervîn

Weka ku xwendevan dizanin, Kurd, li Kurdistanê û li derveyê welêt, di 21'ê Adarê de Newrozê pîroz dikin. Ji bo wan, ev cêjn du rêzayên (mana) wê hene : Cêjna serxwebûna netewî ku bingeha wê Efsana Kawa û Dehak e û cêjna Sersalê, ango destpêka beharê, ku gelên din ên Îranê jî pîroz dikin.

Lê hin nivîskarên kurd ji me re gûmanan tînin ser vê mêjuyê (tarîx). Memet Emîn Bozarlan di pêşgotina JIN I (*) de, li ser vê yekê ji xwe pirsan dipirse, ji bo ku du ji nivîskarên vê kovarê, Kurdiyê Bedîsî (Xelîl Xeyalî) û Memdûh Selîm tê de goti bûn ku 31'ê Tebaxê "cêjna Rizgarîya Netewî" bû, ku ew hîn jî dewam dike û ku ev cêjn sembola serketina Kawa dijî Dehak li Demawendê ye. Xelîl Xeyalî navê wê dike "Cêjna Kurd" û dibêje ku ew bitenê ji aliyê Kurdan tê pîroz kirin, û Memdûh Selîm jî dibêje ku ew "Roja Kawe ya taybetî" û "Roja Kawe ya Netewî" ye. Ango, li gora wan, ev cêjna netewî ku di 31'ê Tebaxê de tê pîroz kirin û ku bingeha wê efsana Kawa ye ne ya Newroza ku em di 21'ê Adarê de pîroz dikin. Jîn ji Newrozê re gotiye "Sersal", "roja civakî", ne "Newroz". Memdûh Selîm dibêje ku Sersal û Newroza Îraniyan di eynî demê de tên.

Ekrem Cemîl Paşa jî gûmaneke din dixê serê me ! Ew di pirtûka xwe "Kurtebir dîrok a Kurdistan", 1971 de ji cêjna 31'ê Tebaxê re rêzayekî din dibîne. Ew dîroka wê ji me re dide nasîn û wê girêdide şerrên Med û Sîtan: Di 625 berê mîladê de, Key Aksar dibe padişahê mezin ê Mîdyâ û şerrekî gelek dijwar dijî Imperatoriya Aşûrî dike. Dema ku ew bi vegirtina (işgal) Nînewa, paytexê Aşûr, xerîk (mijûl) dibe, Sîf dikevin Kurdistanê û wî neçar dikin ku vegere û Sîtan biqewirîne. Key Aksar derdê wan çend salan dikişîne. Şevêkê, ew sofrê ji serokên wan re radixe, wan serxweş dike û serên wan hemiyan jêdike, û Sîtan mayî jî ji Kurdistanê diqewirîne. Wê şevê bixwe, 31'ê Tebaxê, gel li herderê agir vêdixe, vê serfira-ziyê pîroz dike û navê vê cêjnê dike "cêjna tol hildan" (cêjna intiqamê) yan "cêjna kurd" !

Ev nivîsên cihê nîşan didin ku hîn dîrok û çanda me bi awakî kûr û sîstematîk ne hatiye lêkolîn. Em hêvî dikin ku gelek lêgerînên zanyarî ji aliyê Kurdan bixwe karibin di dema me de bêtir ronahî û zelalî bînin ser dewlemendiyên ku em xwediyên wan in.



(*) Jîn kovara "Kürd Teavûn ve Terakkî Cemiyeti" bû. Wê di 1918 de, li Stembolê dest bi derketinê kir û ew bi kurdî û tirkî, bi tîpên erebî, dihat weşandin. M. E. Bozarlan wê li Swêdê ji 1985 heta nuha ji nuh de çap dike, tîpên erebî werdigerîne tîpên latînî û tirkîya osmanî jî werdigerîne tirkîya nûjen. Hetan nuha wî 4 Cildên wê weşandine.

E m

Sed sal, hê bêtir:
 roj bi roj,
 meh bi meh
 û her sal
 me bang kir û dikin:
 BO AZADÎ RABIN!
 BI YEK BIN!
 O
 em davêjin dijmin
 û dibêjin:
 ew ne rind in,
 ne jî şêwe-çak û dilpak in,
 û dîsa û dîsa,
 car li dû car,
 her dem,
 tim û tim deng tê:
 BIJÎ AZADÎ!
 SERXWEBÛN!
 Lê
 me çi kir?
 Me çi guhert?
 Me çi dît,
 çi nedît?
 Me çi kir û çi nekir?
 Ne neyêr şêwe guhertin,
 ne jî me;
 cîhan jî nehat guhertin.
 O
 jiyana berdewam e,
 dunê difertile,
 û deqe bi deqe
 mirin li şûnekê,
 jiyana li ya din,
 nû û kevin rê didin hev,
 hevûdin dikemilînin.
 Em dizanin:
 mirin birine,
 zû-dereng li pêş e,
 lê
 mirina hêdîkan,
 mirina bi êşandina salan,
 mirina tarîbûnê
 yeke tiji jan e,
 û
 ev e babetê mirina me,
 mirina hêdîkan e,
 mirina bi jan e,
 mirina hezar brînên kûr e,
 mirina şeva reş û qûl e.
 O
 car din têye gotin:
 neyar û yar ji hev derxin,
 yan, dost û hevalan binasin;
 vê rê û wê rê berdîn,
 yan, vê û waya han bigirin;
 lê
 her kes ji bîr radike,
 ku sed sal e wisa tê gotin,
 berdewam e kirîn û frotin,
 her dimîne guvaştin û dotin.

Şahîne B. SOREKLÎ
 (VII-87)

N î r o z

Nîroz e Nîroz e Cêjna me Kurda ye.
 Nîroz e Nîroz e Roja me xorta ye

Nîroza rengîn e
 sorgul kemilî ne
 gelo ma çi doz e ?

Nîroz e Nîroz e Cêjna me Kurda ye
 Nîroz e Nîroz e Roja me keça ye

Xweş kêf û seyran e
 govend û dîlan e
 dilê min talan e
 tim ciwan û soz e

Nîroz e Nîroz e Cêjna me Kurda ye
 Nîroz e Nîroz e Roja me xorta ye

Keç xwe dixemilîne
 newşa xwe hiltîne
 dilê min dêşîne
 kal, gewr û boz e

Nîroz e Nîroz e Cêjna me Kurda ye
 Nîroz e Nîroz e Roja me keça ye

Kurdistan şêrn e
 çiya xemilîne
 kesk û sor û şîn e
 bê xwelî û toz e

Nîroz e Nîroz e Cêjna me Kurda ye
 Nîroz e Nîroz e Roja me xorta ye

Pir cêjnan bibînin
 Kurdistan bistînin
 Dujmin jê derînin
 Cêjna we pîroz e

Nîroz e Nîroz e Cêjna me Kurda ye
 Nîroz e Nîroz e Roja me keça ye

Bindest

Ji Kurdîstana Sûriyê

R Ê Z Î M A N A K U R D Î

(Z a r a v ê K u r m a n c î)

- XII -

Mîr Celadet BEDIR XAN û R. LESCOT (*)

IV. NÎŞANK LI SER PAREKAN

102. Hemî parek, di her yek ji teşeyên (awa) wan de, dengdêreke wan a pêşîn heye. Her gaveke ku gotineke ku bi kîteyê vekirî diqede parekê distîne, her du dengdêr li hev dikevin (bi fransîzî : hiatus). Ev lihevketin her gav bi yek ji van du awayan tê dûr kirin :

- a) Teşeya biservehatî (muntazam) : xistina dengdêreke girêdanê navbera dengdêra dawîn û parekê (li bend 15, 16, 18, 19 binêre).
- b) Hevgirtina parekê bi dengdêra dawîn re.

Bikaranîna (istîmal) dengdêreke girêdanê her gav mumkun e, lê hevgirtin-bitenê di çend rewşan de tê pejirandin (qebûl kirin). Teşeyên hevgirtî, gava ku bibin, bêtir tî bi kar anîn, ji bo

ku ew kurttir in.

NÎŞANK. Bi awakî giştî, teşeyên hevgirtî û nehevgirtî tucar di eynî zemanî de, di eynî peyvikan de, nayên dîtin. Xuya ye ku bikaranîna dengdêra girêdanê nemaze di peyvikên *Rojhilatê* de dibe û ku ya teşeyên hevgirtî her ku meriv ber bi *Rojavayê dûr* dikeve dûbaretir (bêtir) dibe. Ev nîşank ne bitenê ji bo taybetiyên (xusûsiyet) ku bikaranîna parekan nîşan dide ye, lê ji bo hemî diyarbûneyên (hadiseyên tebîî) weka wan, yê ku ewê paşê bîn xuya kirin, jî dibe.

103. Gotinên ku bi "a" diqedin. Dengdêra girêdanê "y" ye. Parek dikarin xwe bi dengdêra dawîn jî bigirin.

- a) Gotinên nêr ên bi "-a"; nîşe : Zava.

| PAREK | TEŞEYA BISERVEHATÎ | TEŞEYÊN HEVGIRTÎ |
|-------|--------------------|------------------|
| -ê | Zavayê min | Zavê min |
| -ên | Zavayên min | Zavên min |
| -ek | Zavayek | Zavak |
| -ekî | Zavayekî qenc | Zavakî qenc |
| | | Zavêkî qenc |
| | | Zavekî qenc |
| -in | Zavayin (hin zava) | Zavan |
| | | Zavên |
| -ine | Zavayine qenc | Zavane qenc |
| | | Zavêne qenc |



(*) Grammaire Kurde, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris 1970. Wergerandin, fransîzî-kurdî: Pervîn.

Nîşeyine din : Çiya, bira, peya, ga, giya, ra, ba.

b) Gotinên mê yên bi "-a"; nîşe : Çira.

| PAREK | TEŞEYA BISERVEHATÎ | TEŞEYÊN HEVGIRTÎ |
|-------|--------------------|--|
| -a | Çiraya min | Çira min |
| -ên | Çirayên min | Çirên min |
| -ek | Çirayek | Çirak Çirêk Çirek |
| -eke | Çirayeke geş | Çirake geş Çirêke geş Çireke geş |
| -in | Çirayin | Çiran Çirên |
| -ine | Çirayine geş | Çirane geş Çirêne geş |

Nîşeyine din : Serma, ka, ta.



104. Gotinên ku bi "e" diqedin. Deng-
dara girêdanê "y" ye; hevgirtin tê

pejirandin.

a) Gotina nêr a bi "-e"; nîşe : Pale.

| PAREK | TEŞEYA BISERVEHATÎ | TEŞEYÊN HEVGIRTÎ |
|-------|--------------------|--|
| -ê | Paleyê pîr | Palê pîr |
| -ên | Paleyên pîr | Palên pîr |
| -ek | Paleyek | Palêk Palak Palek |
| -ekî | Paleyekî | Palêkî pîr Palakî pîr Palekî pîr |
| -in | Paleyin | Palên Palan |
| -ine | Paleyine | Palane pîr |

Nîşeyine din : Yekane, perçe, bexçe, çelte (çente), gewende (qereçî).

b) Gotina mê ya bi "-e"; nîşe : Perde.

| PAREK | TEŞEYA BISERVEHATÎ | TEŞEYÊN HEVGIRTÎ |
|-------|--------------------|------------------|
| -a | Perdeya min | Perda sor |
| -ên | Perdeyên min | Perdên min |
| -ek | Perdeyek | Perdêk |
| | | Perdak |
| | | Perdek |
| -eke | Perdeyeke sor | Perdêke sor |
| | | Perdake sor |
| | | Perdeke sor |
| -in | Perdeyin | Perdên |
| | | Perdan |
| -ine | Perdeyine | Perdene sor |

Nîşeyine din : Mase, cade, merge (ava goşt û xwarin), hevêrke (navçe), gore.


105. Gotinên ku bi "ê" diqedin. Parekên tê guhertin (bi "î", di hin peyvikan de; cihê bi "y"eke ahengî redigihêjin wan; li bend 16 binêre). Hin teşeyên hevgerî "ê"ya dawîn a van navan bi "e"yekê jî tîr pejirandin.

a) Gotina nêr a bi "ê"; nîşe : Malxwê (xwediye mulk).

| PAREK | TEŞEYÊN BISERVEHATÎ | TEŞEYA HEVGIRTÎ |
|-------|---------------------|-----------------|
| -ê | Malxweyê ciwan | Malxwê ciwan |
| | Malxwiye ciwan | |
| -ên | Malxweyên ciwan | Malxwên ciwan |
| | Malxwiye ciwan | |
| -ek | Malxweyek | Malxwêk |
| | Malxwiyek | |
| -ekî | Malxweyekî ciwan | Malxwêkî ciwan |
| | Malxwiyekî ciwan | |
| -in | Malxweyin | Malxwên |
| | Malxwiyin | |
| -ine | Malxweyine ciwan | Malxwên ciwan |

Nîşeyine din : Ketxwê (serokê gund), pê (pî).





b) Gotina mê ya bi "-ê"; nîşe : Dê.

| PAREK | TEŞEYÊN BISERVEHATÎ | TEŞEYA HEVGIRTÎ |
|-------|----------------------------|------------------------|
| -a | Deya te Diya te | |
| -ên | Deyên qenc Diyên qenc | Dên qenc |
| -ek | Deyek Diyek | Dêk Dak |
| -eke | Deyeke qenc Diyeke qenc | Dêke qenc Dake qenc |
| -in | Deyin Diyin | Dên |
| -ine | Deyine qenc Diyine qenc | Dêne qenc |

Nîşeyine din : Rê, mê, xwê (xwey).

106. Gotinên ku bi "î" diqedin. Girêdana Teşeyên hevgirtî bitenê bi parekên ahengî bi "y"ekê tê kirin; "î"ya dawîn nebinavkirinê tên pejirandin. bi "î" tê guhertin (li bend 15 binêre).

a) Gotina nêr a bi "î"; nîşe : Rêwî (kesê ku digerre).

| PAREK | TEŞEYA BISERVEHATÎ | TEŞEYA HEVGIRTÎ |
|-------|--------------------|-----------------|
| -ê | Rêwiyê kal | |
| -ên | Rêwiyên kal | |
| -ek | Rêwiyek | Rêwîk |
| -in | Rêwiyin | Rêwîn |
| -ine | Rêwiyine kal | Rêwîne kal |

Nîşeyine din : Tî, rovî, serî, derî, rîspî, xanî.

b) Gotina mê ya bi "-î"; nîşe : Kebanî (kevanî).

| PAREK | TEŞEYA BISERVEHATÎ | TEŞEYA HEVGIRTÎ |
|-------|--------------------|-----------------|
| -a | Kebaniya qenc | |
| -ên | Kebaniyên qenc | |
| -ek | Kebaniyek | Kebanîk |
| -eke | Kebaniyeke qenc | Kebanîke qenc |
| -in | Kebaniyin | Kebanîn |
| -ine | Kebaniyine qenc | Kebanîne qenc |

Nîşeyine din : Rî, mêranî, xizanî, dewlemendî.



107. Gotinên ku bi "û" diqedin. Girêdana ahengî bi alîkariya "w" dibe. "û"ya dawîn bi "î" tê guhertin. Lê, li hin navçeyan (li bend 19-20 binêre),

"y" dêlva "w" tê bi kar anîn; wê gavê "û"ya dawîn qet naguhere. Teşeyên hevgirtinê bi pareka nebinavkirinê tên pejirandin.

a) Gotina nêr a bi "-û"; nîşe : Rû.

| PAREK | TEŞEYÊN BISERVEHATÎ | TEŞEYA HEVGIRTÎ |
|-------|---------------------|-----------------|
| -ê | Riwê min | |
| | Rûyê min | |
| -ên | Riwên spehî | |
| | Rûyên spehî | |
| -ek | Riwek | Rûk |
| | Rûyek | |
| -kî | Riwekî spehî | Rûkî spehî |
| | Rûyekî spehî | |
| -in | Riwin | Rûn |
| | Rûyin | |
| -ine | Riwine spehî | Rûne spehî |
| | Rûyine spehî | |

Nîşeyine din : Dû, gû, mû.



b) Gotina mê ya bi "-û"; nîşe : Xwesû.

| PAREK | TEŞEYÊN BISERVEHATÎ | TEŞEYA HEVGIRTÎ |
|-------|----------------------------------|-----------------|
| -a | Xwesiwa min Xwesûya min | |
| -ên | Xwesiwên min Xwesûyên min | |
| -ek | Xwesiwek Xwesûyek | Xwesûk |
| -eke | Xwesiweke qenc Xwesûyeke qenc | Xwesûke qenc |
| -in | Xwesiwin Xwesûyin | Xwesûn |
| -ine | Xwesiwine qenc Xwesûyine qenc | Xwesûne qenc |

Nîşeyine din : Berû, tû.

108. Gotinên ku bi "o" diqedin. Girêda-
na ahengê bi "w" tê dabîn (temîn) kirin
(li hin navçeyan, bi "y"; li bend 18

binêre). Teşeyên hevgirtî mumkun in,
bi parekên nebinavkirinê.

a) Gotina nêr a bi "-o"; nîşe : Zaro.

| PAREK | TEŞEYÊN BISERVEHATÎ | TEŞEYA HEVGIRTÎ |
|-------|--------------------------------|-----------------|
| -ê | Zarowê min Zaroyê min | |
| -ên | Zarowên qenc Zaroyên qenc | |
| -ek | Zarowek | Zarok (1) |
| -ekî | Zarowekî qenc Zaroyekî qenc | Zarokî qenc |
| -in | Zarowin Zaroyin | Zaron |
| -ine | Zarowine qenc Zaroyine qenc | Zarone qenc |

Nîşeyine din : Çilo (pelên hişk), ço (darê hişk), stro (qiloç), ro (çemê piçûk).

(1) Di rewşa "zaro" de, ev teşeya hevgirtî tucar nayê bi kar anîn, ji bo ku meriv dikare wê bi piçûkera "zarok" tev li hev bike. Lê ev hevgirtin di gotinên din ên bi "-o" de gelek caran dibe, weka sto "stû" (stok "stuyek").

b) Gotina mê ya bi "-o"; nîşe : Co (kanal).

| PAREK | TEŞEYÊN BISERVEHATÎ | TEŞEYA HEVGIRTÎ |
|-------|--------------------------|-----------------|
| -a | Cowa kûr Coya kûr | |
| -ên | Cowên kûr Coyên kûr | |
| -ek | Cowek, coyek | Cok |
| -eke | Coweke kûr Coyeke kûr | Coke kûr |
| -in | Cowin Coyin | Con |
| -ine | Cowine kûr | Cone kûr |

Nîşeyine din : Serşo (hemam).

109. Gotinên ku di kîteya wan a dawîn de "i" heye. Weka ku me li jor dît

Nîşe : Qetla wî (dêlva qetila wî).

Keçka spehî (dêlva keçika spehî).

Lê di gotinine din de, li gel ragi-

handina parekê, "i" dimîne.

Nîşe : Mezinê gund (mezî).

Gotina wî rast e (gotin).

Meriv di peyvê de hînî naskirina gotinên van her du celebên zû hîn dibe. (li bend 101, Nîşank binêre), hebûna parekekê, di hin rewşan de, dibe sedema ketina vê "i"yê.

Dûmahî heye



XEBATA ME

10 KANÛN 87

Vekirina Raberiya (exposition) Mafên Mirov û Gelan li Navenda Çandî ya Dinant, nêzîkî bajarê Namur. Ev raberî, ku ji aliyê 17 rêxistinên beljîkî yê giring hati bû pêk anîn, mehek û heftekê ajot. Gelek şexsiyet û nûnerên rêxistinên beşdarî wê şevê bûn.

10-18 KANÛN Û 4-13 ÇILE 88

Raberiya Mafên Mirov û Gelan : em bi raxistina pirtûk, kaset, xalî û cillên kurdî beşdar bûn.

12 ÇILE

Mezintirîna Koordînasyonên beljîkî, C.N.A.P.D. (Comité National d'Accueil pour la Paix et le Développement), ku her sal xwepêşandana (meşîn) mezin a dijî çekên atomîk pêk tîne, ji me xwest ku em agahdariyekê li ser pîrsa Kurdistanê ya giştî bidin. Nûnerê ji Têkoşer vê daxwaziyê anî cih.

6 SEBAT

Agahdarî li ser pîrsa kurdî ji endamên rêxistina giring, **Mouvement Chrétien pour la Paix** re, li bajarê Liège. Ji derveyî axaftinê, me du filmên vîdêo nîşan dan û gelek pirtûk û broşûrên kurdî firotin.

19 SEBAT

Şeva Fedayînen Îranê (Piranî). Endamê ji Têkoşer muzîk û stranên kurdî pêşkeş kirin.

20 SEBAT

Şeva Fedayînen Îranê (Hindikayî). Em bi stranên kurdî û raxistina pirtûkan beşdar bûn.

5-13 ADAR

Li Brukselê, Centre International Rogier, her sal raberiyeke navnetewî ya pirtûkan, **Foire du Livre**, sê hefteyan dajo. Îsal, **Wezaretê Çandê ya Beljîkî** bangî nêzîkî 60 rêxistinên ku ew alîkariya wan dike kir, û me hemî bi hev re "standeke" gelek mezin danî. Têkoşer 13 pirtûk û broşûrên kurdî, bi zimanên cihê, raxistin. Ji nîv milyon kes bêtir beşdarî vê raberiya giring bûn.

30 ADAR

Xwepêşandana dijî nijadkujiya HALABCA, li Kurdistanê Iraqê, li ber sefaretxana Iraqê. Ev xebat bi navê **Kurdên Beljîka çêbû**. Gelek Kurdên ku ji her aliyên Kurdistanê hatine beşdarî wê bûn û nûnerên rêxistinên beljîkî, iraqî, îranî û tirk jî hati bûn. Bi ser de jî, nûnerên piraniya partiyên



beljîkî û çend endamên Parlamana Ewropa jî hatin û hin ji wan piştgiriya xwe gotin. Her du televîzyonên beljîkî, radyo û piraniya rojnaman vê xwepêşandane weşand. Berê wê bi çend rojan jî, me daxuyaniyeke çapê bi piştgiriya rêxistinên beljîkî yê giring, ji bo mehkûmkirina hovîtiya hikûmeta Iraqê, weşand (li rûpel 3 binêre).

DI MEHÊ DE CAREKÊ

Civînên Koordinasyona Mafên Mirov û Gelan. Nuha endamên wê gihajtine 48 rêxistin.

WEŞAN

Me du broşuran, yek bi fransîzî û yek bi hollandî, li ser xebata xwe ya salên 1986-87 weşandin :

- Bilan 1986-87
- Info-Blad 1986-87
- Gotarek di rojnama Drapeau Rouge de.
- Du kovarên beljîkî, ya Université de Paix û ya Mouvement Chrétien pour la Paix, gotarine dirêj li ser Kurdistanê nivîsîn.

A P P E L

AIDE MEDICALE AU KURDISTAN D'IRAK

Si vous voulez aider les victimes du GENOCIDE KURDE commis par le gouvernement irakien à l'aide d'ARMES CHIMIQUES, versez la somme que vous désirez à :

CCP 000-0000060-60
MEDECINS SANS FRONTIERES - BELGIQUE
rue Deschampsleer, 24 - 1180 BRUXELLES
OPERATION KURDISTAN

P.S. Des montants de 1000 fr. et plus sont fiscalement déductibles.-

MANIFESTATIE VOOR DE AMBASSADE VAN IRAK

Om te protesteren tegen de volkerenmoord op de Koerden vanwege de Iraakse regering zullen de KOERDEN IN BELGIE een manifestatie organiseren :

Datum : woensdag, 30 maart 1988, om 14 u.

Plaats : Ambassade van Irak, Floridelaan 131, 1180 BRUSSEL (UKKEL)

TÊKOŞER'DEN HABERLER

10 ARALIK 1987: Namur'a yakın Dinant' in Kùltür Merkezinde İnsan ve Halkların Hakları sergisinin açılışı yapıldı. Bu sergiyi Belçika'dan 17 büyük kuruluş düzenledi. Beş hafta süren serginin a çilişına önemli şahsiyet ve temsilciler katıldılar.

10-18 ARALIK 1987 ve 4-13 OCAK 1988:

İnsan ve Halkların Hakları sergisi: İnformasyon sergimiz ve milli kıyafetlerimiz ile katıldık.

12 OCAK 1988: Belçika'nin en büyük örgütlerinden C.N.A.P.D. (Comité National d'Accueil pour la Paix et le Développement) istegi üzerine Tekoşer' den bir temsilci onların düzenlediği gecede genel olarak Kürdistan üzerine bilgi verdi.

6 ŞUBAT: Mouvement Chrétien pour la Paix istegi üzerine Kürdistan konulu bir seminer verdik. Tartışmanın yanında iki adet video belgesel filmi gösterdik.

19 ŞUBAT: İran Halk Fedaileri gecesi: Tekoşerden bir kişi Kürt müziğini sundu.

20 ŞUBAT: İran Halk Fedaileri (azınlık) şenliği: Müzik ve inforasyon sergimiz ile katıldık.

5-13 MART: Brüksel Centre International Rogier de, her sene uluslararası bir kitap fuarı düzenlenmektedir. Bu fuar üç hafta sürer. Belçika Kùltür Bakanlığı 60 yakın örgütü fuara katılmaları için çağrıda bulundu. Bu 60 örgüt müşterek

TÊKOŞER

Koördische Arbeiders en
Studentgemeenschap in België

INFO-BLAD

1986-7

tiidschrift

N 4-5

TÊKOŞER

Union des Travailleurs et Etudiants
Kurdes en Belgique

BILAN

1986-7

périodique

N 4-5

FOIRE INTERNATIONALE DU LIVRE
INTERNATIONALE BOEKENBEURS
INTERNATIONAL BOOKFAIR
INTERNATIONALE BUCHMESSE



BRUXELLES
BRUSSEL
BRUSSELS
BRÜSSEL

bir informasyon sergisi açtılar. Davetli örgütlerin arasında Tekoşer'de vardı ve Kürdistan ile ilgili 13 kitap ile sergiye katıldık. Kitap fuarına 500 000 kişiye yakın insan katıldı.

19 MART: Değişik örgütlerin hazırladığı Arnhem Newrozuna informasyon sergimiz ile katıldık.

30 MART: Halabca'daki toplu katliamı protesto için Irak konsolosluğu önünde gösteri. Bu gösteri Belçika Kürtleri adına düzenlenmişti. Kürdistan'ın çeşitli bölgelerinden Kürtler, Belçika'lı, Irak'lı, İran'lı, Türk ve benzeri milliyetlerden örgütler katılmıştı. Gösteriye Belçika'nın siyasi partilerinin çoğunun temsilcileri ve Avrupa parlamentosunun bazı üyeleri de katılmıştı. Gösteriyi

Belçika'nın her iki televizyon kanalı ve tüm radyo istasyonları yayınladı. Gösteriden öncede kamuoyunu bilgilendirmek için basın bildirisi yayınlamıştık. (sayfa 3e bak).

AYDA BİR: İnsan ve Halkların Haklarını Koruma Koordinasyon toplantıları. Üye örgüt sayısı 53 olmuş.

YAYIN: 1986-1987 yılları bilançomuzu iki dilde broşür halinde yayınladık.

- Bilan 1986-1987

-Info-blad 1986-1987

-Drapeau Rouge dergisinde Kürdistan ile ilgili bir makale.

-Barış Üniversitesi ve Mouvement Chrétien Pour la Paix yayın organlarının da Kürdistan ile ilgili uzun iki yazı yayımlandı.

le 23 mars 1988

Communiqué de presse

Condamnation du génocide au Kurdistan d'Irak

Les Kurdes de Belgique, soutenus par les organisations signataires,

- Condamnent fermement le génocide perpétré par le gouvernement irakien à l'égard du peuple kurde dans le Kurdistan irakien.



a.s.b.l. maison de la culture
de l'arrondissement de Dinant

EXPOSITION

« DROITS DE L'HOMME,
DROITS DES PEUPLES »

Maison de la Culture (1^{er} étage)

DU 11 AU 18 DECEMBRE 1987

DU 04 AU 29 JANVIER 1988

En coproduction avec Oxfam-Dinant, Amnesty International, l'Université de Paix de Namur, la Médiathèque de la Communauté Française, etc...

